## Hêvî çima hewce ye?

Hêvî ji sê beşan pêk tê: xwesteka guherînê, hêza guherînê û bendewarî, dema ku em guherînek (domdar) nabînin. Gava ku mirov ji 30'yî heya despêka 60'î bi pirsgirêkek re rû bi rû dimîne, ew piranî li ser astengiyên li derveyî yên li pêşiya wan e. Rêyên çalakiyê ji bo domandina hêviyê... ***Abdulillah Polat / R.8***



## Hê jî di bîra nifşên îro de ye

11'ê gulanê salvegera şehadeta hunermend Mizgîn e û hunermend Seyîdxan têkildarî hunera wê ji rojnameya me re axivî. Seyîdxan anî ziman ku Hozan Mizgîn bi stranên xwe bandor li ser nifşên salên 80'î û 90'î kiriye û her wiha stranên wê hê jî li ser zimanan in û di bîra nifşên îro de ne... ***R.11***



# xwebûn

10-16 GULAN 2021 HEJMAR: 73 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Ziman nasname û sembol e

15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî li me hemûyan pîroz be! Nivîskar û mamosteya zimanê kurdî Ronayî Onen diyar kir ku hêvî ye ku kurd qeyd û bendên li ber azadiya zimanê xwe bi destê xwe hilweşînin û wiha axivî: "Nasnameya neteweyî li ser hin hîman tê pênasekirin wekî ziman, dîrok, ax û ol. Ji nav sembolên ku endamên neteweyê xwe bi wan pênase dikin a herî zêde girîngî pê tê dayîn ziman e... ***R.4***

## Zarok û zaroktî

Zarok û zaroktî du peyvên hêja ne ku belkî em gelek caran li civatan bînin ziman, gotûbêjan bikin û lê bikolin. Bêguman zarok li her cih û warî hene. Her wiha gelek sedemên çêkrina zarokan hene. Mirov ji bo ku zêde bibin, hêzdar bibin, an tehma dêûbavtiyê derxin, ji bo dewama navên xwe, ji bo alîkariya kar û barên xwe û bi gelek sedemên cur bi cur zarokan çêdikin. Zarok û jiyana zarokan ji çêbûna wan heta mezinbûna wan bûye mijara civak û welatan. Hebûna, nebûn, nexweşî, mirina û geşedana wan her tim bûye mijara nîqaşê. Ev nîqaş jî bi xwe re têgiheke mîna zaroktiyê derxistiye holê. Zaroktî ew têgih e ku divê em gelekî serê xwe pê biêşînin. Lê beriya ku em rewşa zaroktiyê fam bikin, hewce ye ku em rewşa zarokan ji duh heta îro hinekî bi ta û derzî bikin. Heta serdema navîn zarok di nav jiyanê de wek endamekî malê nedihatin hesibandin... ***Cemîl Guneş / R.5***




## Polîtîkayên tundiyê

11'ê Gulanê salvegera Peymana Stenbolê ya 10'emîn e ku ji îmzeyê re vebûye. Ji hêla komîteya welatên endamên Konseya Ewropayê yên îmzeya wan li bin Peymana Stenbolê heye bi munasebeta 10'emîn salvegera peymanê de daxuyanî dan û welatên ku ji pîvanên peymanê dûr ketine şermezar kirin. Pîvanên Peymana Stenbolê pîvanên mirovatiyê ye. Desthilatdarî dixwaze civakê hînî tundiya li ser jinan bike û ji bo vê yekê jî çi ji destê wê tê texsîr nake. Li welatekî ku bi biryarname û giştînameyan tê birêvebirin, mirov nikare behsa pîvan û rêgezekê jî bike... ***Dûrket Suren / R.2***

# Artêşa tirk asê maye û derbên mezin dixwe



Dewleta tirk li herêmên Zap, Avaşîn û Metînayê dest bi operasyona dersînor kir û li gorî agahiyên hatine bidestxistin heta niha bi dehan leşkerên tirk hatine kuştin û HPG'ê ragihand ku di pevçûnan de 7 endamên wan jiyana xwe ji dest dane. Her wiha gelek helîkopterên dewleta tirk hatine derbkirin. Li hemberî operasyonê bertek zêde dibin û nemaze jî başûrî bertek nîşan didin... ***R.3***

## Konsesûseke giştî ye

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ji bo diyarkirina helwestan li dijî hewldanên qirkirin û dagirkirina Kurdistanê amadekariya konferansekê dike. Hevserokê KNK'ê Ehmed Karamûs têkildarî operasyona dersînor axivî û wiha got: "Konsensûseke giştî ya Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê ye, ji ber ku ew bi tu rengî statu û destkeftiyên gelê kurd qebûl nakin."... ***R.6***

## Rojeva Tirkîya sero çend qalî

Rojeva welat pir hest a. Yew hetî ra operasyonî estê, yew hetî ra zî grevê vêşanîye yê zîndanan dewam keno. Ti destê xo berzî kam hete barê çizî yena. Na mesele epeyê yew wexto rojeva ma meşxul kena. Cuye de tehm nêmendo. Roj nêwîyarena ke yew meseleya newa vecîyena. Hem psîkolojîyê komelî hem zî psîkolojîyê şexsan herimîyayo. Hindayê merdimî xelisîyayîşê xo, xo kiştiş de vînenê. Ma senî hewa ameye na dahkara. Kam ma erdî na darax. Komel de ma kamî ra bipersî şêno na babet de çend qalan vajo. Ez bawer kena ke embazê ke no nuşte wanenê... ***Murat Kan / R.9***

## Tewirê şîdetî

Sernameyê ma "Tewirê Şîdetî" yo. Pers no yo: Tewirê şîdetî zî estê? Bersiv erê yo. Berê, ma henî qal bikerê. Derhêner David Dufresne belgefîlm anto serê na çalakî û şîdeto tede. Nameyê belgefîlmî "The Monopoly of Violence" ("Serdestiyey Şîdetî", bi tirkî kerdo "Şîdet Tekelî") yo. Wexto ke "Yêlegzerdan" çalakî kerdêne şîdet vecîya meydan. Hetê ke ro polîsan hêrîşê çalakkaran kerd, heto bîn ro çalakkaran ra heniyan cay şikitêne, tar û mar kerdêne. Bi aweyke şîdet vecîyabî meydan... ***Cemîl Oguz / R.9***



## Bila Firat azad biherike

Dewleta tirk ava çemê Firatê ku ji Bakurê Kurdistanê derbasî Rojava dibe, wek çekek siyasî li dijî rêvebiriya xweser bi kar tîne. Di halê heyî de 83 gund bê av mane... ***Felemez Ulug / R.6***

## Çend cureyên qirkirinê hene?

Mijara vê nivîs ê av e. Çawa tê zanîn çiqasî ava çemê Ferat û Dîcleyê bi destê mirovên dilpak, meraqdar, kedkar û hilberîner bûye dergehê avakirina şaristaniyê jî, mixabin bi destê hovan jî dibe warê kuştin, ferman, sirgûn, wêranî, wêrtasî, zordestî û talankirinê. Dewleta Tirkiyeyê bi çêkirina bendava Kebanê dest da ser çemên Kurdistanê. Gelek gund, zevî, bax û bostan di bin ava Kebanê de man. Civata hat koçberkirin, pêşî li Xarpêtê xaniyê dewletê çêkiribûn hatin bicihkirin. Lê ev nebû star û rê li ber hejarî û belengaziyê negirt. Gel neçar ma welat terk bike û ji bo debara xwe çû deverên cuda. Lê ji xêncî armanca peydakirina enerjî û avdaniya çandiniya pîşesaziyê avakirina bendavan ya ji bo valakirina niştecihê herêmê, guherîna demografî û xistina xizmeta şer bi projeya GAP'ê dest pê kir... ***Ehmed Pelda / R.6***

## Çand li bejn û bala xwediyê xwe tê

Dema mijar çand be barê nivîsandin û ramandinê jî giran dibe, ji ber ku têgeha çandê di nav xwe de gelek wateyan dihebîne. Di vê nivîsara xwe de ez ê hewl bidim çend wateyên çandê rave bikim û balê bikişînim ser çandkujiya ku niha di nav civakê de bi pêş dikeve. Belê van rojan dema rewşa guharîna civakî li ber çavên xwe diwezînînim; çend 'deqên' li ber çavên min dikevin; çandkujiya ku bi pêş dikeve li pêşber çavan beloq dike! Çand wekî têgîneke sereke gelek wateyan di nav xwe de dihebîne. Mînak çand maka ziman e. Dîsa çand maka perwerdekariyê ye. Dema kesekî xweşbîn... ***Mîrza Ronî / R.11***

# Dayik Emîne nîşaneya hêz û wêrekiyê ye



Adar Şaman

**Emîne Şenyaşar bi vê helwesta xwe bûye dengê hemû dayikên ji bo azadî, demokrasî, edalet û rûmetê têdikoşîn. Dayik Emîne jineke werek û serbilind e. Biryara wê ya têkoşînê ya li dijî zilmê rewa û pîroz e**

Emîne Şenyaşar, bê tirs li hemberî zilmê têdikoşe. Ji kujer û hevkarên wan hesabê komkujiya zarokên xwe dipirse. Wer xuya ye ku malbata Şenyaşar heyanî encamê wernegirê, dê çalakiya xwe ya edaletê bidomîne. Edalet nayê xwestin, hesap tê pirsîn. Dayik Emîne vê gavê li hemberî nokerî, paşverûtiyê, çîna serdest a li kêleka desthilatdariyê bi cih bûye, serî rakiriye û berxwedaniyeke mezin raber dike. Çîna serdest a kurd, her ku pişta xwe dide dewlet-desthilatdariyê di serî de li axparêz, azadîxwaz, muxalif û kurdperweriyê dixe. Ev birîna kurdan a navxweyî ku gelekî xedar e û bi hêsanî nayê kewandin, heyanî îro nehatiye dermankirin. Di dîroka Kurdistanê de, bi hezaran mînakên weke dayik Emîne hene.

Mêrê paşverû yê qaşo serweriya xwe li civakê ferz dike, lê xulamê desthilatdariyê ye, bi her awayî koleyê dewlet-deshilatdariyê li ba çîna serdest a kurd pîroz tê dîtin. Ji bo ku rind bikaribe ji deshilatdariyê re xulamiyê bike, bi her awayî xizmet dike û serî ditewîne. Lê li hemberî civaka ku jê ye êrîşkar, kujer û bê hed tevdigere. Mêrê paşverû-noker ji desthilatdarî û dîktatoran gelekî xetertir e. Ji ber ku wê li ku çi bike û çi bêje ne diyar e. Nanê wî li ser kaba wî ye! Ji bo wî ya esas berjewendiyên şexsî û malbatî ne. Ev helwesta paşverû bûye sedem ku civaka kurd parçe bibe û nebe yek. Çanda mêrê noker-serwer, çanda serî tewandinê, tirsonekî, xwe xapandin, ji esil û rasiya xwe rev, xiyanetparêz û berjewendiyên şexsî esas digire.

Ev berhemê çîna serdest ku ji dîrokê heya niha xwe bi gewde kiriye; îro bûye bela serê gelê kurd û têkoşîna şoreşgerî. Ev li pêşiya şoreşa Kurdistanê kelemekî mezin e. Kar û xebatên vê çîna serdest a kurd, fitne bixe nav civakê û minafiqiya nirxên gelê xwe bike. Ev yek heyanî neyartî û kuştinê jî diçe.

Emîne Şenyaşar, li dijî çîna serdest û desthilatdariyê di nav têkoşîna edalet û rumetê bi werêkî li ber xwe dide. Dayik Emîne, qet natirse, bi dengekî bilind diponijê û çi ji dilê wê tê wê bi lêv dike. Êşa xwe daniye hêlekê, bi hêza xwe têdikoşe û ji kujerên zarokên xwe hesap dipirse. Ji ber ku dilê wê diêşe, qahir, keder û hêrsa wê dihêle ku ew bi hêz bibe. Êşa wê gelek mezin e, ji ber wê têkoşîn û berxwedana wê jî wisa çendî mezin e. Dayik Emîne, jinek bi hêz û gelekî bi xîret e. Sekna wê, berxwedan û têkoşîna wê mînak e. Ev sekna wê nokeran dixe nav tirs û xofê. Bi gotina Emîne Şenyaşar a dibêje; 'ez edaletê dixwazim' di esasê xwe de dibêje 'ez ji kujerên zarokên xwe hesad dipirsim'.

Her ku li dîmênê dayik Emîne dinêrim her bi tenê ye. Tu kesek li ba wê nîn e; bi tena serê xwe li hemberî zilma serdemê disekine. Li ber qesra zilmê, di çalakiya hesapirsînê de bi tena serê xwe ye. Emîne Şenyaşar, bi hêrs û ruhê dayika tolhildêr heroj wê kelha zilmê ya ku li ber rûniştî ye bi ser zaliman de dihilweşîne. Hêvî û baweriya xwe bi xwe heye. Israra wê ya di çalakiya hesabpirsînê de, ji bo tevahiya dayikan dibe çavkaniya têkoşînê. Ev dibe sedem ku serdest ji sekna dayik Emîne pakî û hesaban bikin. Dayik Emîne, dema ku qedexeya derketinê hebe jî, çalakiya xwe ya hesabpirsînê li mala xwe dide domandin û bê rawestan çalakiya xwe dike.

Dema ku em li çalakiya dayik Emîne Şenyaşar temaşe dikin, em jê hêz û wêrekiyê hîn dibin. Em şanaz dibin. Rêya têkoşînê nîşanî me dide. Emîne Şenyaşar bi vê helwesta xwe bûye dengê hemû dayikên ji bo azadî, demokrasî, edalet û rûmetê têdikoşîn. Dayik Emîne jineke werek û serbilind e. Biryara wê ya têkoşînê ya li dijî zilmê, bêadaletî û çîna zilimkar rewa ye û ew çendî pîroz e. Pêwîst e, di roja dayikan de bi hezaran dayik biherikin cem Emîne Şenyaşar û çalakiya wê li her qadê berbelav bikin. Lowa hêza dayikê ya birêxistinkirî, mîna çalakiya Emîneyê dikare kelha zilmê ji binî ve birûxîne.

Di kesayeta dayik Emîne Şenyaşar a têkoşer û berxweder de, destê dayikan pîroz maç dikim û Roja Dayikan li tevan pîroz be!



# Rewşa jinan û polîtîkayên tundiyê



Dûrket Suren

Di nav tundiya dewletê de ku bi birdozî dike, bêguman têkoşîn ne hêsan e. Li her derê qedexe, dorpêçkirin, tundî, kuştin, şer û xizaniyê heye. Di her rewşa neyînî de ku li welêt diqewime, em jin zêdetir para xwe jê digirin. Mixabin ev yek rastiyeke din a hukmê serdestiyê ya sedan salan a li ser jinan pêk aniye û desthilatdariya AKP'ê jî ji bo per û baskên jinan ên têkoşer bişikîne hemû rêbazên paşverûtiyê bi kar tîne.

Piştî ku Tirkiye bi biryarnameya yekkesî ji Peymana Stenbolê vekişiya nêzîkatiya bloka AKP-MHP'ê ya li dijî jinan bi awayekî fermî xwe aşkera kir. Serokê AKP'ê û wezîrê wî yê karê navxweyî, bi wî zimanê xwe yê zayendparêziyê bê hedên xwe li ser jinan biryar û daxuyaniyan didin, xwe weke vîna jinan dihesibînin. Ew encax dikarin pişta kujerên jinan mist bidin. Bi vê rastiyê jî ne mimkun e hukmê biryarên wan ên der barê jinan de li gel jinan hebin. Bi çi awayî be jî jin ji bo maf û jiyana xwe dê her li ber çavên wan têbikoşin û dê di dawiyê de jî bi ser bikevin.

**Salvegera Peymana Stenbolê**

11'ê Gulanê salvegera Peymana Stenbolê ya 10'emîn e ku ji îmzeyê re vebûye. Ji hêla komîteya welatên endamên Konseya Ewropayê yên îmzeya wan li bin Peymana Stenbolê heye bi munasebeta salvegera peymanê daxuyanî dan û welatên ku ji pîvanên peymanê dûr ketine şermezar kirin. Pîvanên Peymana Stenbolê pîvanên mirovatiyê ne. Desthilatdarî dixwaze civakê hînî tundiya li ser jinan tê kirin, bike û ji bo vê yekê jî çi ji destê wan tê texsîr nake. Di meha nîsanê de di meclîsê de komîsyona lêkolînê ya tundiya li ser jinan hat avakirin, lê ev komîsyon dê nikaribe şûna Peymana Stenbolê bigire ku bi her awayî dikarîbû rêya tundiya li ser jinan bibire. Jixwe dema min navên endamên komîsyonê yên ji partiyên AKP û MHP'ê dîtin bi rastî kenekê bi min girt. Çi karê zilaman di nav komîsyoneke ku tundiya li ser jinan lêkolîn dike heye, ev jî cihê nîqaşê ye. Tu dibêjî qey AKP û MHP partiyên wisa wekhevîtî û azadiyan diparêzin dê di mijara tundiya li ser jinan de jî bêalî tevbigerin. Naxêr! Ma ne ew kes in ku sedema kuştina jinan hatiye asta qirkirinê. Ew carekê naxwazin tundiya li jinan û kuştin jinan bên axaftin, naxwazin bikeve rojeva civakê, îja rabûne di komîsyonê de ew dê tundiya li ser jinan lêkolîn bikin. Heger li holê tundiyek hebe û li hemberî vê yekê deng dernekeve û di ser de jî bêbertekbûn hebe wê demê tê wê wateyê ku tu jî parçeyê hişmendiya qirkirina jinan î û ev yek tenê bi endamtiya komîsyonan jî çareser nabe. Heger li welatekî ewlehiya jinekê jî tune be, tê wê wateyê ku pêşeroja wî welatî bi giştî di xetereyê de ye.

**Binpêkirina pîvanên mirovatiyê**

Ji ber wê yekê desthilatdariyê bi betalkirina Peymana Stenbolê ne tenê pîvanên peymanekê, di heman demê de hemû pîvanên mirovatiyê binpê kirine.

Jixwe li welatekî ku bi biryarname û giştînameyan tê birêvebirin, mirov nikare behsa pîvan û rêgezekê jî bike. Herî zêde jî ev ji salekê zêdetir e nexweşiya koronayê heye û desthilatdarî ne ji bo pêşiya şewbê bigire, ji bo desthilatdariya xwe biparêze û xwe û alîgirên xwe hê dewlementir bike ket nav hewldanan. Jinan di nav malê de bi dorpêça tundiya zilamên herî nêzî wan asê kir, gel di birçîbûn û xizaniyê de hişt, guhê xwe ji daxwazên sedan girtiyên di greva birçîbûnê de ne girt, ji bo pêkanînên wan ên dij-demokratîk dernekevin holê rêyên têkoşînê bi qedexeya çalakiyan û di ser de jî girtina dîmen û dengên polîsan li rojnameger û li gel girt.


Bi giştînameya qedexeya kişandina dîmen û tomarkirina dengên polîsan a Midûriyeta Emniyetê ya Giştî baş tê zanîn ku dixwazin rê li ber derxistina holê ya îşkenceya polîsan bigire. Weke hezaran, ji pêş çavên min jî dîmenê Kemal Kûrkût derbas bû. Her çend doza kujerên wî bi beraetê bi encam bibe jî dewlet dê her li pêş çavên me sûcdar be û dadgehên wan ên bêedaletî jê dibare, dê nikaribe vê yekê biguherînin. Ji ber wê yekê jî divê her kes xetereya li pêşiya xwe baş hesab bike.

**Xeyala welateke azad û wekhev**

Bi vî awayî em dibînin ku êdî tu mesele ji meseleyeke din a vî welatî cudatir nîn e. Divê li hemberî her rewşeke neyînî, bi çi awayî be jî dengek hevpar derkeve. Beriya her tiştî divê nêzîkatiya AKP-MHP'ê ya li ser jin û tevahiya civakê weke ji rêzê neyê dîtin. Divê em hemû vê pirsê ji xwe bikin: em ê çawa xwe hînî îşkenceyên wan û binpêkirinên wan bikin ku her roj zêdetir dibin.

Rast e, tundî ji vê erdnîgariyê tu carê kêm nebûye. Di her serdemê de dewletê hêza xwe li ser gel bi kar aniye. Komkujî, kuştin, kiryarên nediyar, koçberkirin, îşkence, bêmafî, bênasnameyî, bêzimanî û gelek rêbazên din mirov dikare bihejmêre, bê ka çawa dewlet tundiyê bi awayekî birdozî li gel kiriye. Lê min di serî de jî got, li dijî van yekan têkoşîn helbet ne hêsan e, helbet ji her alî ve zehmetiyên xwe hene. Lê em vê yekê jî ji bîr nekin, heger îro zindan bi hezaran kesan ve dagirtî be û li dijî pêkanînên dewletê hê jî girtî hêza berxwedanê bi xwe re dibînin, sedem ew e ku ji bo xatirê xeyala welatekî wekhev û azad e.





# Li dijî tecrîdê greva birçîbûnê dewam dike

Li girtîgehan çalakiyên greva birçîbûnê yên bêdem û dorveger ên li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nêzî 170 roj in didomin. Ji roja ku çalakiyên greva birçîbûnê dest pê kirine heya niha li girtîgehan binpêkirinên mafan zêde bûne û ji ber tevdîr nayên girtin, girtî bi xetereya şewba Covîd-19'ê re rû bi rû ne.

Endama Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) a Şaxa Stenbolê parêzer Destîna Yildiz ku hefteya borî di nav heyeta parêzeran de cih girtibû û serdana girtîgehan kiribû, diyar kir ku tecrîd li tevahiya girtîgehan belav bûye û rewşa heyî veguheriye îşkenceyeke fiîlî.

Destîna Yildiz destnîşan kir ku biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û raporên Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) de jî hatiye tespîtkirin ku tecrîda li Îmraliyê îşkence ye û got: "Niha jî pandemî kirine hincet û bi vê dixwazin tecrîda li Îmraliyê mayinde bikin. Mafê hevdîtina vekirî, mafê werzîşê û mafên sohbetê hwd. ên girtiyan tên astengkirin. Her wiha li girtîgehan astengiyek li ber rojname û kovaran jî heye. Sansura li ser nameyên girtiyan zêde bûye. Gava em van pêkanînan hemûyan bînin cem hev, em bi awayekî aşkera dibînin ku tecrîda girankirî ya li Îmraliyê li tevahiya girtîgehan belav bûye." Yildiz da zanîn ku divê dewlet qanûnên xwe pêk bîne û dawî li vê tecrîdê bîne."

Sekreterê Giştî yê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (THÎV) Coşkûn Usterci jî destnîşan kir ku li girtîgehên Tirkiyeyê her tim binpêkirinên mafan ên giran rû didin û her diçe ev yek vediguhere tiştekî mayinde. Usterci bi lêv kir ku binpêkirinên mafan ên li girtîgehan "dijî rûmeta mirovan" e û bal kişand ser qanûna Jimare 7242'yan. Usterci destnîşan kir ku divê tecrîda li Îmraliyê ku li dijî Pîvanên Mandela yên Neteweyên Yekbûyî (NY), tewsiyeyên CPT'yê û Qanûna Înfazê ya Jimare 5275'a ye bi dawî bibe, ji lew re tecrîd dijî rûmeta mirovahiyê ye. ***AMED***

# Bertekên li dijî êrîşan zêde dibin

Navenda Nûçeyan

**Dewleta tirk di 23'yê nîsanê de li herêmên Zap, Avaşîn û Metînayê yên başûrê Kurdistanê operasyona dersînor da destpêkirin û operasyon didomin. Hat ragihandin ku di navbera artêşa tirk û gerîlayên HPG û YJA Starê de pevçûn dewam dikin**

Dewleta tirk li herêmên Zap, Avaşîn û Metînayê dest bi operasyona dersînor kir û li gorî agahiyên hatine bidestxistin heta niha bi dehan leşkerên tirk hatine kuştin û HPG'ê ragihand ku di pevçûnan de 7 endamên wan jiyana xwe ji dest dane. Her wiha gelek helîkopterên dewleta tirk hatine derbkirin û herî dawî wezareta parastinê ya dewleta tirk li xwe mikur hat ku helîkopterên wan nikarin li ser erdê deynin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî pevçûnên dawîn daxuyanî da û diyar kir ku di pevçûnên dawîn de li herêma Zapê 6 û li qada Mamreşo ya Avaşînê jî 5 bi giştî 11 leşkerên tirk hatine kuştin. ANF'ê dîmenên çekên leşkerên tirk ku ji aliyê gerîlayên HPG'ê ve hatine bidesxistin weşand. Li aliyê din artêşa tirk li Metîna û Avaşînê bi balafirên şer êrîş pêk anî û di van êrîşan de windahiyên gerîlayan çênebûne.

Êdî ji aliyê derdorên cuda û bi dengekî bilind tê gotin ku armanca dewleta tirk dagirkirina axa başûrê Kurdistanê ye û rasterast deskeftiyên gelê kurd hedef tên girtin û ger pêşî li operasyonê neyê girtin dê hebûna kurdan bikeve talûkeyê.

Parlementerê YNK'ê Luqman Werdî di civîna Parlementoya Herêma Federal a Kurdistanê de axivî û wiha got: "Dewleta Tirkiyeyê hatiye nav xaka herêmê, niyeta wê ya vekişînê nîn e. Ev tê wê wateyê ku dagirkerî metirsiyê dixe ser siberoja Herêma Kurdistanê. Divê êdî Parlementoya Herêmê helwesta xwe nîşan bide."

Li aliyê din bertekên li hemberî êrîşên artêşa tirk zêde dibin. Gel, hunermend û siyasetmedarên başûrê Kurdistanê bi awayekî aşkera nerazîbûnên xwe tînin ziman. Welatiyên navçeya Kelar a Germiyanê dan zanîn armanca dewleta tirk a êrişên li ser xaka başûrê Kurdistanê ewe ku axa Başûr dagir bike û vegerîne ser nexşeya Tirkiyeyê. Welatiyan bêdengiya desthilata Herêma Federal a Kurdistanê jî rexne kirin û gotin ku serokê hikûmetê bi daxuyaniyên xwe dagirkeriyê rewa nîşan dide û xizmeta dagirkeran dike. Welatiyê bi navê Serbest Celal got ku Tirkiye bi xeyalên dewleta Osmanî tevdigere û dixwaze herêmê dagir bike. Aram Mela Nûrî jî da zanîn ku lazim e kurd mil bidin hev û destur nedin êrîşan. Li Şengalê jî li dijî operasyona dersînor meşeke girseyî hat lidarxistin û operasyon hat şermezarkirin.

Hunermendê bi nav û deng ê kurd Necmedîn Xulamî bertek nîşanî êrîşên dewleta tirk da û diyar kir ku dewleta tirk li dijî hemû kurdan e, ne tenê PKK'ê. Xulamî li dijî dagirkeriyê yekitiya kurdan girîng dibîne û wiha got: "Serkeftina gerîla serkeftina pêşmergeyan e."

Pêşmergeyên Dêrîn ji Rojnewsê re axivîn û ragihandin ku ew amade ne rakin çekê û li dijî dagirkeriya dewleta tirk şer bikin û piştgiriyê bidin gerîlayên HPG'ê. Pêşmergeyê Dêrîn ê bi navê Mehmûd Ehmed got ku ev şer şerê hemû kurdan e û divê piştgiriyê bidin gerîlayan. Pêşmergeyê Dêrîn ê bi navê Pêşrew Reşîd helwesta hikûmeta Başûr rexne kir û got ku ev şerê dagirkeriyê ye û divê bêdeng nemînin.

Rayedarên dewleta tirk bi awayekî aşkera dibêjin ku armanca wan li herêmê avakirina baregehên leşkerî ye. Dewleta tirk dema li deverekê baregehên leşkerî ava bike êdî ji wir dernakeve.



# Bi bêrîkirinê Roja Dayikan bi bîr xist

Di heyama hilbijartinên 24'ê hezîrana sala 2018'an de parlementerê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz bi parêzvan û xizmên xwe re serdana dikana malbata Şenyaşar kiribûn. Di serdanê de endamên malbatê rexneyên xwe yên der barê rewşa hilbijartinê de anîbûn ziman lê ev rexne ne bi dilê parlementerê AKP'ê û xizmên wî bûn.

Li ser vê yekê Parlementer bi parêzvan û xizmên xwe ve êrîşê malbata Şenyaşar kiribû. Di van êrîşan de hevserê Emîne Şenyaşar, Hacî Esvet Şenyaşar û her du lawên wê Celal Şenyaşar û Adil Şenyaşar li ber çavên wê hatin kuştin. Girêdayî bûyerê ji malbata Şenyaşar; Fadil Şenyaşar û ji malbata parlamenterê AKP'ê hin kes hatibûn darizandin. Di 2'ê nîsanê de danişîna dozê li Malatyayê pêk hatibû û di encama danişînê de 37 sal û 9 meh ceza li Fadil Şenyaşar ê girtî hatibû birîn û 18 sal ceza jî li Enver Yildiz ê xizmê parlamenterê AKP'ê hatibû birîn.



**Peyama Roja Dayikan**

Emîne Şenyaşar Roja Dayikan bi bîr xist û destnîşan kir ku berê zarokên wê bi diyariyan vê rojê pîroz dikirin û wiha got: "Îro roja dayikan e lê li derdora min kesek nehiştin ku vê roja min pîroz bikin. Celalê min û Adilê min ev roj li min pîroz dikirin. Wan ez ji wan bêpar hiştim. Fadilê min jî xistine zindanê. Ez bi qurbana wan bim. Dayika we cejnan û van rojan bêyî we nikare derbas bike. Ji cihê hûn niha lê razane rabin werin, wekî berê destê min ramûsin. Ez we hembêz bikim. Van zaliman hûn ji min veqetandin."

**Zilmeke wiha nehatiye dîtin**

Dayikê bal kişand ser têkoşîna xwe ya edaletê û wiha berdewam kir: "Ez ê dev ji têkoşîna xwe bernedim. Bira lawê min berdin, bira ev zilm bi dawî bibe. Ev edaleteke çawa ye? Qeydên nexweşxaneyê hatine veşartin. Yên ku zaroyên min kuştin li derve digerin. Ev çima nayên girtin? Em diçin ba dozger ew me diqewirîne. Gunehê me dixin stuyê xwe. Zaroyên min li ser kar hatin kuştin, kesî zilmeke wiha nedîtiye. Wêneyê mêzînekê bi dadgehan ve kirine, lê badilhewa ye, dibêjin edalet heye lê lawê min ev 3 sal in belasebeb di girtîgehê de ye.

Dayik Şenyaşar axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Zarokên min li ber çavên min hatin qetilkirin. Kî dîtiye li nexweşxaneyê mirov bên qetilkirin. Heke ev qetl bê veşartin, bira yê ku wê vedişêrin jî rastî êşeke mîna êşa me bên. Dozger çima rastiyan vedişêre? Cîhanê tev de vê zilmê bihîst lê hûn çima vedişêrin, qet wijdana we tune ye? ***RIHA***

# Kovara Wêje û Rexneyê bi hejmara 12'an derket

Hejmara 12'an a Kovara Wêje û Rexneyê ya bi sê zaravayên kurdî (kurmancî, kirmanckî, soranî) derket. Kovar ji sala 2014'an ve weşanê dike û çar mehan carekê dertê. Kovarê piştî hejmara 11'an ji ber tunebûna nivîsan navber dabû weşanê. Naveroka hejmara 12'an a kovarê wiha ye.

Serdar Ay Kovar: Der, Derdor, Tor. Jordi Tegel Gorgas: Pêwendiya Franko-Kurdî li Lubnan û Sûriyeyê (1930-1946) û Bandora Wê li ser Nasnameya Neteweyî ya Kurdî, wergera ji fransî: Nebîyê Dûro. Dilawer Zeraq: Wekî Şûngeha Dij-Mêtinger; Gor di çîrokên "Leylana Rastiyê" û "Li Goristaneke Amedê" de. Zana Zengenî: Ji Nifşê Hawarê Şa'îrekî nepenî: Xemgîn. Firat Aydinkaya: Di Derbareyê "Nameya Ji Rewşenbîrekî Kurd Bo Mistefa Kemal" da (Wergera ji Tirkî: Sînan Gultekîn). Elîf Gun: Ji Perspektîfa Rexneya Femînîst a Wêjeyî, Lêkolînek li ser Çîroka Nûredîn Zaza a bi navê "Gulê". Serdar Ay: Li ser Sansûr û Sirgûnê bi Yaqob Tilermenî ra Hevpeyvîn




Merve Şivan: Nêrîneke Rexneyî li ser Romana 'Êvara Perwaneyê' ya Bextiyar Elî Elîf Gun: Danasîna Çend Xebatên Di Derbarê Qonaxa Hawarê da. ***AMED***

## DÎROK Û ZIMAN XERCÊN NETEWESAZIYÊ NE

# Ziman qadeke berxwedanê ya civakî ye

Navenda Nûçeyan

*Bi boneya nêzîkbûna 15'ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî ku roja derçûna hejmara yekemîn a kovara Hawarê ye, li ser rewşa zimanê kurdî, girîngiya Hawarê ji bo kurdan û rol û mîsyona wê ya netewesaziyê, me bi mamoste Ronayî Onen re ev hevpeyvîn kir.*

**Te li ser derketina kovara Hawarê û erka Hawarê ya di netewesaziya kurdan de tezek serkeftî nivîsand. Tu kovara Hawarê û bêjara (dîskurs) ku di Hawarê de serdest e çawa dinirxînî?**

Di serî de cejna zimanê kurdî pîroz dikim û hêvî ye ku em qeyd û bendên li ber azadiya zimanê xwe bi destê xwe hilweşînin. Wekî hûn jî dizanin kovara Hawarê di 15'ê Gulana 1932'yan de, bi pêşengiya Celadet Bedirxan ve derçû. Celadet û hevrêyên xwe da zanîn ku ew ê zimanê kurdî bi pêş ve bixin lewre li gorî wan "ziman şertê bingehîn ê hebûna miletekî bû". Dema mirov li kovarê hûr dibe mirov dibîne ku Hawar hewleke xurt a netewesaziyê ye. Anthony Smith amaje pê dike ku di hemî tevgerên neteweyî de rewşenbîr xwediyê roleke girîng in. Li gorî wî, rewşenbîr û pispor, bo avakirina hemhestiyê û sazkirina nasnameya neteweyî, tenê kevneşopî û ziman navejînin, lê di heman demê de ew dîrok û kevneşopiyan ji nû ve kifş dikin û wateyeke siyasî ya nû li van kifşan bar dikin. Rewşenbîrên kurd jî ji destpêka sedsala 20'emîn ve hewl dane ku kurdan li dor nasnameyeke hevpar bicivînin da ku kurd bi rêya vê nasnameyê li ser çarenûsa xwe xwedî got bin. Wekî tê zanîn sedsala 19'emîn sedsala berbelavbûna hizra netewetiyê ye. Di destpêka sedsala 20'emîn de vê hizrê di nav rewşenbîrên kurd de jî cih girtibû. Weşanên heyamê yên wekî Roj-î Kurd, Hetaw-î Kurd û Jîn nîşan didin ka rewşenbîrên demê çendî hewl dane ku gelê kurd li dora nasnameyeke hevpar a neteweyî bicivînin bi qewlê wan "wan ji xewa xefletê şiyar bikin". Ji ber sedemên ku tên zanîn rewşenbîrên demê di geşepêdana hişmendiya neteweyî ya di nav kurdan de bi ser neketin. Hêviya ku ji serhildanan kirin jî pêk nehat. Têkçûna Serhildana Agiriyê ya di sala 1930'î de kir ku rewşenbîrên kurd stratejiya xwe ya têkoşînê veguherînin.

Lewma wan dest bi avakirina dîskûreke neteweperwer kir da ku li dora nasnameyeke neteweyî berxwedanekê pêk bînin. Celadet û hevrêyên xwe xwest ku bi qewîkirina hestiyarên kurdbûnê ya bi rêya zimanî û perwerdeya bi zimanê kurdî hişmendiyeke kurdewar di nav gel de ava bikin. Wan wisa bawer dikir ku li gel hin sedemên stratejîk û kêmderfetiyan, kêmasiya hişmendiya neteweyî ya di nav gel de yek ji sedemên têkçûna serhildanê bû. Wan bi vê motîvasyonê dest bi weşana Hawarê kir.

Neteweperwerî hesta ayîdiyeta civatekê ye ku endamên wê bi hin sembol, bawerî û awayên jiyanê ve tên nasîn an jî xwe didin nasîn. Nasnameya neteweyî ji aliyê pêşengên neteweperwer ve li ser hin hîman tê pênasekirin wekî ziman, dîrok, ax û ol. Ev hîm wekî xercên netewesaziyê girîng in. Di pênaseya nasnameya neteweyî de yek an jî çend ji van sembolan karîger dibin / tên karîgerkirin. Ji nav sembolên ku endamên neteweyê xwe bi wan pênase dikin a herî zêde girîngî tê dayîn ziman e.

Ev xalên hevpar ên dîskûra netewesaziya sedsalên 19 û 20'emîn di Hawarê de jî xalên bingehîn in. Hawar xwediyê nîvendeke berbiçav a neteweperwer e. Ew li ser girîngiya mîrata çandî ya kurdî disekine; li ser girîngiya perwerde û zimanî disekine û wan wek alavên xwe-naskirina hemî civaka kurd dihesibîne. Ji aliyekî ve sînorên axa kurdan destnîşan dike ji aliyê din ve bi şanazî amaje bi dîroka qedîm a kurdan dike. Di dîskûra Hawarê ya neteweper de hêmana herî zêde te karîgerkirin jî wekî gelek mînakên din ên netewesaziya heyama navborî, ziman e.

**Gava meriv vedigere li serdema Hawarê dinihêre meriv dibîne ku zimanê kurdî hem wekî amûrekî dekolonîzasyonê hem jî wekî armanceke dekolonîzasyonê hatiye tercîhkirin. Di vî warî de tu çi difikirî?**

Di hewlên dij-kolonyal de ziman wekî qadeke berxwedanê ya civakî tê sazkirin. Yek ji taybetmendiyên bingehîn ên zordariya kolonyal, kontrola li ser zimanan e. Di dema kolonîzasyonê de, kolonîker bi piranî zimanê xwe derbasî gelê kolonîzekirî dikin an jî serdestiya zimanê xwe teşwîq dikin; heta zimanê wî gelî qedexe jî dikin. Di dawiyê de zimanê serdestan dibe navgîna terîfa têgihên wekî 'heqîqet', 'rêz' û 'rastî' ye. Bi bilindbûna dengê dij-kolonyal hikmê zimanê serdest tê redkirin. Wek bertekeke li hember bandora sîstematîk a zimanên kolonyal, rewşenbîr û çalakvanên dij-kolonyal vegereke giştî pêk tînin ji bo zimanên xwe yên neteweyî. Ji ber vê yekê ye ku di gelek tecrûbeyên dij-kolonyal de rewşenbîr tevgereke zimanî didin destpêkirin ku di nîvenda wê de redkirina bikaranîna zimanê kolonîkeran heye. Bi vê redkirinê re zimanê dayikê wekî zimanê neteweyî tê nîşandan. Rewşenbîrên dij-kolonyal vê carê heqîqetê ji nû ve ji binî ve û bi zimanê xwe dinivîsin. Mirov dikare di karên Celadet û rêhevalên wî de şopên vê pratîka dij-kolonyal bigerîne. Bi raya min, wan hewl dabû ku bi saya tevgereke zimanî qadeke berxwedanê ya dij-kolonyal ava bikin û bikaranîna zimanê dagirkeran red bikin. Di dîskûra netewesaziya kurdî de ziman wekî qadeke berxwedanê a dij-kolonyal tê destnîşankirin. Di dema îroyîn de jî xeteke neteweperwer heye ku bi vê yekê re ye. Helbet ev xet jî ji aliyê bîrdozî, paşxane, ray û raman û pêşniyarên bo siberoja kurdan de meylên cuda dihewîne.




Bi vê redkirinê re zimanê dayikê wekî zimanê neteweyî tê nîşandan. Rewşenbîrên dij-kolonyal vê carê heqîqetê ji nû ve ji binî ve û bi zimanê xwe dinivîsin. Mirov dikare di karên Celadet û rêhevalên wî de şopên vê pratîka dij-kolonyal bigerîne

**Di heyamên netewesaziyê de, gelek neteweyên cîhanî ketin nav hewldanên afirandina kanoneke neteweyî. Dîrokeke nû dihat afirandin û rehên wê dîrokê jî têra xwe dihat kevnarkirin. Rola kovara Hawarê di babeta afirandina kanoneke neteweyî ya kurdî de çi bû?**

Li gorî Hobsbawm, netewe ji rabirdûya xwe pêk tê; rabirdû neteweyekê li hemberî yên din meşrû dike û kesên ku rabirdûyê (ji nû ve) dinivîsin jî, rewşenbîrên neteweperwer in.


Rewşenbîrên kurd ên heyamê jî hay jê hebû ku divê ew ji bo gelê kurd rabirdûyekê pêşkeş bikin da ku kurd xwe wekî biryardarên çarenûseke hevpar bibînin, bi vê sedemê ji hejmarên ewil ên Hawarê û pê ve wan xwestiye dîroka kurdan ronî bikin. Wan dizanî ku di avakirina hişmendiya neteweyî de roleke dîroka nivîskî heye, lewma wan hewl daye ku bi rêya qalkirina kesayet, dewlet û mîrektiyên sereke yên kurdan, haya kurdan bi dîroka wan a "rewnaq" bixin. Nîşandana 'kesayetên dîrokî' û 'serdemên zêrîn' wekî xaleke girîng a meşrûtiya 'netewebûnê' tê dîtin. Celadet û hevrêyên xwe jî xwestiye bi rêya nivîsandina rabirdûyeke qedîm di nav kurdan de hevhestiyariyekê pêk bînin. Wekî mînak, Zerdeşt di rûpelên Hawarê de wekî serokê dînî yê qedîm tê nasandin, li gorî Kamiran Bedirxan baweriya Zerdeşt jî felsefeya dîrokî ya kurdan e. Kamiran Bedirxan behsa pirtûka pîroz Zend-Avestayê jî dike. Behsa hinek kesayetên wekî Selahedîn Eyûbî, Ehmedê Xanî, Mîr Bedirxan hwd. jî tê kirin. Ev kes wekî mezinên kurdan tên wesifkirin. Di Hawarê de Dewleta Medan jî wekî bingeha çavkaniya kurdan tê binavkirin.

Di heman demê de dîrok ji bo gelên bindest dibe qada têkoşîna li hember desthilatdariyê jî. Di têkoşîna xwe ya li hemberî dagirkeriyê de berhemên nivîskarên neteweperwer xwedî îdîaya ji nûvestendina dîroka xwe ne. Celadet û hevrêyên xwe jî ji nû ve nivîsandina dîroka kurdan wekî peywireke bingehîn a têkoşîna li hember desthilatdaran pênase dikin.

**Gelo pêdiviya me bi Roja Zimanê Kurdî heye an na? An jî meriv dikare rojên bi vî rengî wekî mîta aîdiyetê bi nav bike û çima 15'ê gulanê?**

Ez ji dawiyê dest pê bikim. Çima 15'ê gulanê? Ji ber ku kovara Hawarê ku di mêjûya zimanê kurdî de wekî qonaxeke girîng tê qebûlkirin, cara ewil di vê rojê de der çûye. Heke dê roja zimanê kurdî hebe ji vê rojê watedartir roj tune ye li gorî min, ji ber ku kovara Hawarê xizmeteke mezin kiriye ji bo zimanê kurdî. Bingeha zimanê standart daniye û kurdî bi taybetî zaravayê kurmancî kiriye zimanê nivîskî. Hemî xebatên li dû Hawarê referansa xwe ji wê digirin, lewre ev çavkaniyeke wisa ye ku di çavên hema bêje temama kurdan de meşrû ye. Li dû wî ji aliyê gelek sazî û kesan ve xebat hatine kirin, ji bilî çendan tu xebat wekî ya Celadet bi awayekî giştî nehatiye pejirandin. Helbet çend sedemên vê yekê hene. Di serî de Celadet gelek tiştên bingehîn çareser kirine, zimanê kurdî bi taybetî zaravayê kurmancî bi awayekî serkeftî pênase kiriye, rêzikên wê tespît kirine, hevoksazî û peyvsaziya wê dane nasandin. Ya duyem, Celadet ne kesayetiyeke îroyîn e, kevnarebûna wî, wî meşrûtir dike. Ew êdî semboleke girîng a dîroka zimanê kurdî ye û ev yek heta radeyekê rê li ber digire ku xebatên wî bên gengeşekirin.

Mît, xatirat, nirx, kevneşopî û sembol taybetmendiyên sereke ne di avakirin û berdewamiya nasnameyên neteweyî de. Kristi Haav dibêje, referansên baş avakirî ji bo hebûna zimanî, mînak çêkirina mîtên der barê bavûkalên hevpar de ku bi heman zimanî diaxivin, wî zimanî li ber çavên axêverên wî dike zimanekî kevnar, resen û berdewam. Em dibînin ku ev yek ji bo kurdan jî wisa ye. Kesên wekî Celadet Bedirxan û Ehmedê Xanî bûne sembolên zimanê kurdî. Bi ya min ji bo gelên bindest ku hêj bi nasnameya xwe di qada navneteweyî de li ser çarenûsa xwe nebûne xwediyê gotinê ev sembol bo berdewamiya hesta aîdiyetê hewcedariyek e. Bîra kolektîf bihevrebûnê û yekitiyê pêkan dike, rê li ber berxwedanê vedike her wiha li ber têkoşînê jî. Ji aliyê din bibîranîn û qedirdayîna kedkarên vî zimanî jî gelekî girîng e, ji ber ku ev ziman hê jî di pozîsyona berxwedanê de ye.



## Ronayî Onen kî ye?

Dibistana seretayî, ya navincî û lîse li Dêrikê qedandiye. Li zanîngeha Marmarayê di beşa perwerdeyê de xwendiye. Di dibistan û kursên cuda de mamostetiya îngilîzî kiriye. Teza xwe ya lîsansa bilind li zanîngeha Bilgiyê, di beşa lêkolînên çandî de li ser kovara Hawarê nivîsandiye. Di sala 2020'î de pileya doktorayê ji beşa sosyolojiyê girtiye. Ji sala 2007'an ve ye wekî mamoste û aktîvîsta zimanê kurdî xebatê dike. Di navbera 2009-2018'an de li zanîngeha Bilgiyê mamostetiya kurdî kiriye.

# Zarok û zaroktî

Gelo ew nêzîkatiyên me bo zarokan xizanî bû yan nezanî bû? Derheqê hunerên wan ên hişî, zimanî, derûnî û kesîtî de hestiyarî tune bû, ji bo wan a girîng saxmayîna zarokan bû

Cemîl Guneş

Zarok û zaroktî du peyvên hêja ne ku belkî em gelek caran li civatan bînin ziman, gotûbêjan bikin û lê bikolin. Bêguman zarok li her cih û warî hene. Her wiha gelek sedemên çêkirina zarokan hene. Mirov ji bo ku zêde bibin, hêzdar bibin, yan tehma dê û bavtiyê derxin, ji bo dewama navên xwe, ji bo alîkariya kar û barên xwe û bi gelek sedemên curbicur zarokan çêdikin. Zarok û jiyana zarokan ji çêbûna wan heta mezinbûna wan bûye mijara civakan û welatan. Hebûna wan, nebûna wan, nexweşiyên wan, mirina wan û geşedana wan her tim bûye mijara nîqaşê. Ev nîqaş jî bi xwe re têgiheke mîna zaroktiyê derxistiye holê. Zaroktî ew têgih e ku divê em gelekî serê xwe pê biêşînin. Lê beriya ku em rewşa zaroktiyê fam bikin, hewce ye ku em rewşa zarokan ji duh heta îro hinekî ta û derzî bikin.


Heta serdema navîn zarok di nav jiyanê de wek endamên malê nedihatin hesibandin. Rast an şaş gelek sedemên vê çîrokê hene. Ji ber ku şer zêde bû, nexweşî zêde bû, xela hebû, koçberî hebû û jiyan zehmet bû û zarokan nikarîbûn li ber van bayên xezebê li ber xwe bidin û mixabin an dimirin an jî di nav şert û mercên dijwar de li ser piyan diman. Ji ber van qewimînan li hin cihan nav jî li zarokên xwe nedikirin û heta ku mezin dibûn. Wexta ku zarok heta 6-7 saliya xwe dihatin êdî nav jî li wan dikirin û wek endamekî malê dihesibandin. Êdî karbeşî dikirin di nav hev du de û ew zarokên 6-7 salî jî dibûn xwedî kar an berpirsiyariyekê. Carinan şer dikirin, carinan dibûn sermiyanên malê û carinan jî dibûn mîrê civaka xwe. Gelo di nav me kurdan de çawa bû? Mixabin ne cuda bû û heta demeke nêzîk jî ev tiştên wisa diqewimîn. Jixwe şer ji welatê me kêm nebûye û zarok her tim dibin qurbanên herî bêguneh. Heta 15-20 sal berê jî ji ber nexweşiyê, ji ber bêderfetiyê, ji ber karên zehmet ku jinan dikirin 4-5 zarokên dayikan ji ber wan diçûn. Hin ji wan zarokên xwe dikirin pişta xwe û ji şeveqa xwedê heta êvarê dixebitîn, navên zarokên xwe yên mirî ne, li zarokên xwe yên dijîn dikirin. Hin malbatan ji ber tirsa mirina wan zarokan nasname ji zarokên xwe re dernedixistin. Xwarin kêm bû, xizanî zêde bû û nexweşî belav dibû. Yên sax û binav diman êdî ne zarok bûn, ew karkerên malê bûn, kevanî bûn yan jî sermiyan bûn. Ji van qewimînan jî diyar e ku zarokan ji duh heta îro bi gelek tiştên nexweş re rûbirû mane û malbat jî ji ber gelek sedeman derd û kulê zarokên xwe kişandine.

Piştî rewşa zarokan ya bi giştî êdî hêja ye ku em li dû bersiva çend pirsan bikevin. Gelo fikrên wan, xeyalên wan, hêviyên wan tune bûn? Gelo ji xeynî jiyîna wan qîmeta tiştekî din tune bû? Erê ji bo civakê jîrbûna wan beriya her tiştî dihat. Gelo xizanî bû yan nezanî bû ew nêzîkatiyên me? Derheqê hunerên wan yên hişî, zimanî, derûnî, kesîtî de hestiyarî tune bû. Ji bo wan a muhîm saxmayîna zarokan bû û piştre jî hêza wan ya fizîkî û berpirsiyarên wan ên civakî bû. Lê piştî bi sedan salan dem û dewran guherî helbet. Gelek guherîn çêbûn ji duh heta îro. Şer kêmtir bû li gor berê, xwarin zêde bû, nexweşî hebin jî derman ji wan nexweşiyan re hatin peydakirin, zarok êdî wek berê ji ber dayikan nediçûn, navê kesî li yên din nedihat kirin. Êdî zarok ji roja ewil ve endamekî malê ne, xwedî nasnameyekê û xwedî qîmetekê ne. Wexta ku ev guherîn û pêşveçûn çêbûn bêguman têgihên mîna zaroktiyê derketin. Çunkî ji ber başbûna derfetan dêûbav, derdor zêdetir li cem zarokan diman, liv û tevgerên zarokên xwe zêdetir didîtin û bi çavdêriyên salan hat famkirin ku zarok ne tenê bi ruhê xwe yan jî ne tenê bi jîrbûna xwe hene, ew zarok xwedî taybetiyên cuda ne û bi rengê xwe hene. Ev têgihîştin bû sebeba gelek xebatan. Ango pêdivî bi naskirina zarokan a di nav jiyanê de roj bi roj zêdetir bû. Ev xebat cara ewilî li welatên pêşveçûyî di sedsala 18'an de çêdibin û hêdî hêdî ber bi me ve tê. Bi van xebatan hat famkirin ji xeynî mafên jiyanî hin aliyên zimanî, hişî, derûnî, civakî, kesîtî û fizîkî yên zarokan jî hene. Bi van xebatên xwe zarokan ji mezinan cuda kirin û hemû aliyên zarokan ji taybetiyên mezinan hatin veqetandin. Pênaseyên cuda ji bo zarokan hat kirin, bijîşk ji bo wan hat perwerdekirin, ji bo perwerdeya wan mamoste hatin gihandin. Jiyana zarokan her ku hat naskirin, pêdivî bi gelek tiştên din çêbûn. Wexta ku ev pêşveçûn diqewimîn êdî zarok jî li gor taybetî û cudahiyên xwe di nav xwe de hatin cihêkirin. Her wiha xebatên derheqê zarokan de jî ji hev hatin cihêkirin. Ev xebat li gor taybetiyên zarokan yên zayendî, hişî, zimanî, derûnî û ya herî giring jî li gor temenê zarokan hatin kirin. Xebatên psîkanalîtîk, yên hişî, yên kesîtî, fizîkî hemû li gor van taybetiyan hatine kirin. Ev cudahî jî kêm zêde li gor van serdemên zaroktiyê hatine kirin; beriya zayînê ku rih bi wan dikeve, pitiktî (0-2), zaroktiya pêşî (2-7), zaroktiya navîn (7-12) û zaroktiya dawî (12-18). Bêguman ev xebatên bi vî rengî gelekî hêja ne ji bo mirovahiyê tevan. Her wiha xebatên bi vî rengî rê li ber pêşveçûna zarokan jî vekirin.



Divê em hinekî jî li civaka xwe binêrin, bê ka em li ku ne di vê meseleyê de. Gelo ev xebat û pêşveçûn bandora xwe çi qasî li ser me kurdan kir? Dixwazim di vê nivîsê de herî zêde û bi awayekî kurt balê bidim ser vêya û nivîsê bi dawî bikim. Çunkî êdî xizaniya me kurdan heta radeyekê qediyaye û bi zorê yan bi rehetî em debara xwe bi awayekî dikin. Lê ew li aliyekî, êdî maye hin ferasetên me yên şaş. Ligel ew qaş xebat, lêkolîn û pêşvaçûnan hîn jî ew guherînên ku ji me tê hêvîkirin pêk nehatiye. Çunkî hîn jî em rê nadin zarokên xwe ku ew zaroktiya xwe bijîn. Em bi nêzîkatiyên xwe nahêlin her yek ji wan bi rengê xwe bibişkivin. Em hîn jî bi çavekî tenê li hemû zarokên xwe dinêrin. Em çavên xwe ji cudahiya wan digirin û wan tevan dixin qalibekê. Wexta ku em zarokên xwe ji aliyê serkeftinê ve dinirxînin, em gelek tiştan îhmal dikin. Em pir zû û bi agahiyên şaş zarokên xwe bêqîmet dikin û nahêlin ku bi ser bikevin. Gotinên mîna "Qîza wî dimeşe ya min nameşe. Ew zû peyivî kurê min hîn nepeyivî. Tu çima dereng fam dikî? Matematîka keça wê baş e, ya keça min ne baş e. Kurê min nizane wêneyan xêz bike. Qîza min nizane stranan bibêje" hîn jî di nav me kurdan da qasî ku em jê aciz bibin zêde ye. Divê em ji bîr nekin her zarok ji hev cuda ne. Her zarok li gorî hiş, ziman, huner, zayend, civak, temen, rewşa aboriya malê û li gor rewşa derûniyê pêşveçûnên cuda nîşan didin. Ev ne nexweşî, kêmasî yan jî biçûkî ye, ev cudahî ye. Heke ev cudahî bê zanîn û bê famkirin hingê dê serkftin jî pêk were.

Wek encam mirov dikare bibêje ku zarok bi hebûna xwe çi qas hêja be zaroktî jî ew qas biqîmet û hêja ye. Hebûna zarokan bi tena serê xwe tiştekî îfade nake, ancax bi mafên zaroktiyê manedar e ew hebûn. Heke qîmeteke zarokan hebe di jiyana me de divê em zarokan bi zaroktiyeke baş û xweş tacedar bikin. Hewce ye ku em zarokên xwe çi ji aliyê hişî, çi zimanî, çi fizîkî û çi derûnî baş nas bikin. Li gor taybetî cudahiyên wan dermanan ji derdê wan re peyda bikin û rê li ber pêşketina wan vekin.



Sîdar Jîr

# "Dengê Bêdengîyê" ferhenga li ser kevir e

Berhemên edebî wekî nivîsên li ser tahtan, nasnameya civakekê vedibêjin û diparêzin. Loma ew belgeyên zindî yên civakekê ne. Heger tirsa nivîskar/helbestkar a veşartina hest û hêmayan tune be, wê demê helbestên li ser wan *tahtan/keviran* zelaltir dibin.

**Dengê Bêdengîyê** pirtûka pêşîn a helbestan a Asya Xerzan e. Helbet şîroveya helbestan maye di mista xwendevan de. Loma jî ji kê re çi lazim be yan jî tesîreke çawa li kê bike ew helbest ji bo wan êdî *ew* e. Di ***Dengê Bêdengîyê*** de ji rista pêşîn heta dawiya pirtûkê motîfên hesretê, axê, êşê, bêrîkirinê û bendewarîyeke zêde li ser kevir û daran bi gotinên dêrîn hatine nivîsîn. Di gelek ristan de mirov ji nişka ve bi hesret û *dûrbûna* xwe dihese;

*"Dema ku ez mirim /Min neşon! /Bihêlin ez bibim xwe!/Kefen û xerqe naxwazim /Naxwazim qewl û…/Telqîn û Yasînan"*

***Dengê Bêdengîyê*** hêrs, êş, bêrîkirin û bendewariyê di nav xwe de mîna *qewlêrkekê* bi ahêng vedibêje. Asya Xerzan bi ***Dengê Bêdengîyê*** pîşoyekî dide ser devê birînê û her risteke helbestê êdî dibe rîtuelek ji jiyana qewmekî qedîm. Carinan li ber koka darekê bêçare û dest li rû, carinan bi çîroka penaberekê konê bêdengiyê tê vedan li ser mirov û carinan berê mirov dide rojê û dest li hewa:

*"Roj diçe ava/Berê xwe didim te/Bi hestên jineke Êzdî /Min bide xatirê Xatûna Fexra…"*


Di pirtûkê de her helbestek çîrokeke dirêj e. Asya Xerzan bi zimanekî wêrek, li ser keviran û latan bi xencer û xwînê ferhengek nivîsandiye. Bi wê ferhengê, xwê dixe devê birîna me ya civakî:

*"Bav û birayan /simbêlên mêrxasîyê badidan /li ser termên me…/Min dît bila kes nebîne."*

Dengê bêdengiyê, di bingeha xwe de bi peyvên xwe yên ji ferhenga kevirîn, bi xencer û xwînê hatiye nivîsandin; ev ferheng harmoniya hêrs, evîn, êş, birîn, bendewarî û dûrahiya ji axê ye. Di her ristê de teşhîrkirina wan hest û hêmayan heye. Hemû ristên wê, wekî cihoyan deng bi hev xistine, dikalin, diherikin ser heman *bêdengiyê* û dibe maka ferhengeke dêrîn. Bi pênûsa Asya Xerzan, peyvên wê ferhengê dibin pîşoyê devê birînê…

*"Belkî îşev ronahîyek bixuliqe di vê tarîyê de*
*Belkî em bibihîzin mizgînîyekê*
*Dibe ku îşev hemû tiştên…*
*Tu êşandibin li pişt xwe bihêlî*
*Bêdeng be*
*Belkî deng bi bêdengîyê bikeve"*

**Dengê Bêdengîyê, Asya Xerzan, helbest, 78 rp. Weşanên Sîtav, 2016**



# Erka neteweyî li ser milê her kesî ye

Navenda Nûçeyan

**Endamê KNK'ê Ehmed Karamûs têkildarî operasyana dersînor a dewleta tirk de axivî û bang li gelê kurd, partî û saziyên kurd û hikûmeta Başûr kir ku li dijî êrîşan bibin yek**

Tirkiyeyê di 23'ê nîsanê de bi tevlêbûna hêzên hewayî û bejahî, li dijî herêmên Metîna, Zap û Avaşînê operasyona leşkerî da destpêkirin. Operasyona dewleta tirk, piştî axaftina Serokkomar Erdogan û serokê Amerîkayê Joe Biden pêk hatibû. Piştî operasyonê li hundir û derveyî welat gelek bertek, nerazîbûn ji aliyên gel, sazî, dezgeh, rêxistin, rewşenbîr, rojnameger û hwd. hatin nîşandan. Li gel van nerazîbûnan jî heta niha operasyon didomin û ji dewletên navneteweyî ji li hember êrîşên Tirkiyeyê tu deng derneketiye.

**Bertekên welatiyan**

Welatiyên navçeya Kelar a Germiyanê jî têkildarî êrîşên Tirkiyeyê yên li ser xaka başûrê Kurdistanê bertek nîşan dan û dan zanîn ku armanca dewleta Tirkiyeyê dagirkirina axa başûrê Kurdistanê ye. Welatiyan bêdengiya rêveberiya herêma Kurdistanê jî rexne kirin û gotin, serokê hikûmetê bi daxuyaniyên xwe dagirkeriyê rewa nîşan dide û xizmeta dagirkeran dike.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ji bo diyarkirina helwestan li dijî hewldanên qirkirin û dagirkirina Kurdistanê amadekariya konferanseke neteweyî dike.

**Stratejiyeke navneteweyî**

Têkildarî êrîşên Tirkiyeyê yên li ser başûrê Kurdistanê hevserokê KNK'ê Ehmed Karamûs axivî û diyar kir ku Tirkiye di êrîşên xwe de çekên kîmyewî bi kar tîne û wiha got: "Bêguman ev stratejî ne ya dewleta tirk bi serê xwe ye. Konsensûseke giştî ya Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê ye, ji ber ku ew bi tu rengî statu û destkeftiyên gelê kurd qebûl nakin. Ev êrîşên dagirkeran bê erêkirina dewletên emperyalîst û bi taybetî jî Tirkiye ku berjewendiyên wan di vî şerî de hene, nîn e. Serkêşiya wê jî Îngilîstan, dewletên NATO, Yekitiya Ewropayê û Rûsya dikin."

**Armanca operasyonê**


Karamûs destnîşan kir ku divê her kes di vê qonaxê de seferber bibe ku bikarin pêşî li qirkirin û bikaranîna çekên kîmyewî bigirin û wiha berdewam kir: "Ger em wiha tev negerin hebûna gelê kurd di bin metirsiyeke mezin de ye. Bila tu kes xwe nexapîne. Armanca vê êrîşê dagirkirina tevahî başûr û rojavayê Kurdistanê ye. Li Başûr û Rojava statuyek heye, dixwazin ji holê rakin. Dixwazin ew komkujiya bi serê ermen û suryanan de anîn, li ser serê gelê kurd pêk bînin."

**Amadekariya konfensa neteweyî**

Ehmed Karamûs da zanîn di demeke nêz de dê konferanseke neteweyî li dar bixin û ev tişt anî ziman: "Wek KNK'ê di demeke nêz de amadekariya konferansekê ya helwestwergirtinê li ser asta partî û rêxistinên Kurdistanê dikin. Armanca me ew e ku li dijî xetereya êrîşan, komkujî û dagirkeriyê ji serokên partî, rêxistinên siyasî yên civakî, kesayetên welatparêz, ronakbîr, rewşenbîr, entelektuel helwesteke hevbeş bigirin. Îro erka neteweyî li ser milê her kesî ye. Divê her kes bi vê berpirsiyariyê rabe."

**Bang li hikûmeta Başûr kir**

Karamûs têkildarî agahiyên li ser rêkirina pêşmergeyan li dijî gerîlayan û daxuyaniya Mesrûr Barzanî wiha got: "Rêkirina pêşmergeyan metirsiyeke mezin e. Em bang li pêşmerge, parlamento, hikûmetê dikin ku hesasiyet, gef û xetereya li ser deskeftiyên gelê kurd bibînin. Cîhan bi giştî pê serwext e ku dewleta tirk êdî ji rewşa mirovatiyê derketiye û bûye êrîşkarekî devbixwîn. Li rûxmî wê jî Mesrûr Barzanî ku dibêje 'nakokiyên dewleta tirk bi kurdan re tune ne'. Ev ji heqîqet, parastina deskeftiyên neteweyî gelekî dûr e. Helwest û daxuyaniyên bi vî rengî em bi tu şêwazî qebûl nakin. Daxuyaniyên ku dewleta tirk mafdar nîşan bidin, em şermezar dikin. Em ê bi hemû hêza xwe partî, rêxistin, kesayet, rewşenbîrên ku di bin sîwana KNK`ê de ye li hemberî wan helwestên li dijî deskeftiyên gelê kurd rawestin."





Destar
Ehmed Pelda

## Ji bo kurdan çend cureyên qirkirinê hene?

Dewleta Tirkiyeyê li hember kurdan;

1- Bênavber şerê çekdarî dimeşîne.

2- Bi riya perwerde, çand û civakî asîmîlasyonê berfireh dike.

3- Bi behaneya çêkirina bendavan û şer, cih û warê kurdan hat valakirin, gel li bajarên rojavayê Tirkiyeyê û cîhanê belawela bû. Metirsî ew e ku piştî çend nifşan ev komên pênaber wê ji nijad, çand û zimanê xwe binî ve ji bîr bikin.

4- Wekî niha li Iraq û Suriyeyê tê dîtin herêmên kurdan bi destê hêzên xwe yên leşkerî û çeteyên lejyoner yek bi yek dagir dike. Herêmên desteserkirî jî, şêniyên herêmê sirgûn dike û ji bo bicihbûna tirk û erebên girêdayî xwe xaniyan çêdike.

5- Bênavber siyasetmedar, rewşenbîr, rojnameger, sendîkavan û endamên saziyên sivîl ên kurd û mafê xwe diparêzin digire û bi belasebep sizayên salan dide.

6- Partî, sazî û destgehên kurdan desteser dike, digire yan jî asê dike ku nikaribin kar û xebatekî bimeşînin. Karsaz û serweran bi riya burokrasî, siyaseta nijadperest, mafya û hêzên nepen dorpêç dike û xetên liv û tevgera wan dişikîne.

7- Xwendekar, pîşekar, hunermend, hosta, karmend û karkerên bi fermî ji bo dewletê dixebitin, bi riya sirgûnê, tayînkirinê ji gel, çand, ziman û welatên xwe dûr dixe.

8- Niha jî bi gurkirina şerê avê kurd û hevalbendên kurdan bê av dihêle û şênî ji neçarî koça terka welat dike.

Mijara vê nivîsê av e. Çawa tê zanîn hir çiqasî ava çemê Ferat û Dîcleyê bi destê mirovên dilpak, meraqdar, kedkar û hilberîner bûye dergehê avakirina şaristaniyê jî, mixabin bi destê hovan jî dibe warê kuştin, ferman, sirgûn, wêranî, wêrtasî, zordestî û talankirinê.

Dewleta Tirkiyeyê bi çêkirina bendava Kebanê dest da ser çemên Kurdistanê. Gelek gund, zevî, bax û bostan di bin gola ava Kebanê de man. Civata koçber kir, pêşî li Xarpêtê xaniyê dewletê çêkiribûn hatin bicihkirin. Lê ev nebûstar û rê li ber hejarî û belengaziyê negirt. Gel neçar ma li welêt terk bike û ji bo debara xwe çûn deverên cuda bi cuda.

Lê xêncî armanca peydakirina enerjî û avdaniya çandiniya pîşesaziyê avakirina bendavan a ji bo valakirina niştecihê herêmê, guherîna demografî û xistina xizmeta şer bi destê Ozal û projeya GAP'ê dest pê kir. Wekî planê hatibû aşkerakirin ku divê 2 milyon 500 hezar kes axa xwe terk bike. Jixwe behaneya şer jî lê zêde bû di vê navbeynê de 6 milyon kesî cih guhert û 4 milyonê vî jî ji Kurdistanê çû bajarên Tirkiyeyê û welatên Ewropayê.

Xêncî vê hikûmetên din, bi taybetî jî AKP'ê bendavên bi angaşta ewlehiyê jî xistin meriyetê. Li gor vê herêmên ku gerîla ji bo çûnûhatinê bi kar tînin, bi gel re têkildar dibin bên birîn, golên avê hatin çêkirin, gund hatin valakirin û gel û parêzvanên wan ji hev hatin cudakirin.

Av wekî navgîneke siyasetê tenê di nav sînorê Tirkiyeyê de nehat bikaranîn. Li hember rejîma Suriyeyê û Iraqê jî wek çek hat şixulandin. Li gor qanûnên navneteweyî divê Tirkiye kêmtir 700 metrekup serê yek saniye/çirkî de av bide welatê li ser sînor. Lê bi behaneya ku Suriye destekariya PKK'ê dike Ozal ava ku para Suriyeyê dikeve neda. Heyanî destxistina hin tavîzan, li ser 500-550 metrekupî li hev kirin. Dîsa jî Tirkiye li ser soza xwe nesekinî û car caran ava ku para Suriyeyê ye birî. Xêncî vê ava bi newalan di nav zeviyan re derbas dibe û gubreya kîmyewî re diqelibe jî vegerand li ser çem û bi vî awayî da Suriye û Îraqê. Gava ev ji bo vexwarina gel û sewalan dihat bikaranîn, dibû sebebê nexweşiya penceşêr û yên cuda bi cuda.

AKP ji hikûmetên berê bêhtir avê dixe çeka şer. Piştî dagirkeriya Serêkaniyê li bakurê Suriyeyê xanî, xet, borî û çelên avê jî desteser kir û ava ku ji vir diçe Til Temir, Hesekê û gelek gund û navçeyan birî. Beramberî peyman hat çêkirin jî dijberiyê dike û car caran vê avê dibire. Xêncî vê ava çemê Dîcleyê, ya diçe Suriyeyê li serê saniyê/çirkê daxistiye 200 metrekupî ku ne têra vexwarinê dike, ne têra hilberîna ceyranê û ne jî avdaniyê. Heke AKP û Erdogan bi vî awayî dewam bikin bi milyonan mirov ji neçarî koçberiyê ne û xetereya mirina bi milyonan sewal û raweran jî heye.

Ev sûcê şer e, dijberiya mafê mirovan e, piştguhkirina mafê avê, avdaniyê û dabînkirina xurekan e.

Ev sûc yekser li hemberî kurdan e. Wekî li bakur jî tengasiyê dikişîne. Tê zanîn, bi salan gel ji bo avdaniyê hat teşwîqkirin. Lê niha dewlet û saziyên ceyranê avê nadin, baran jî kêm e û ev dibe sebeba ziyaneke mezin a aboriyê ku gel dîsa ji neçarî hejarî û koçberiyê dimîne.

Lazim e ku ev mijar di asta navneteweyî de bibe mijiara nîqaşan ku saziyên sivîl, dîplomasî û aborî vê bûyerê bi girseyî bikin rojevê.



Xweşkanî
Felemez Ulug

## Bihêlin bila Firat azad biherike

Dewleta tirk di van çend salên dawî de bi hemû derfetên xwe yên leşkerî û siyasî ji bo dijîtiya gelê kurd bi kar tîne. Ji bo di vê polîtîkaya xwe ya antî-kurd de jî bi ser bikeve serî li hemû rê û rêbazên qirêj dide.

Ji Efrînê heya Mexmûrê bi êrîşên eskerî ve hewl dide darbe li destkeftiyên kurd bide. Bi vê armancê li rojavayê Kurdistanê hin dever dagir kir û hin dever jî talan kir. Lê bi vê jî têr nebû.

Zextên dewleta tirk a li ser herêmê bi van êrîşan tenê ne sînordar e. Li cihê ku pê bawer e dikare barbar li rêvebiriya xweser bixe bêyî ku bisekine êrîş dike. Bi van êrîşan ve çavê gel ditirsîne dide koçberkirin û herêmê vala dike.

Cihê di warê eskerî de nikare êrîş bike jî li ser rê û rêbazên cuda disekine ku herêmê vala bike û bigihîje armanca xwe. Ji bo vê jî çi ji destê wê tê dike.

Di van demên dawî de mirov dikare bêje vê polîtîkaya dewleta tirk hîn baştir hat dîtin. Li Kobanê bi qutkirina ava çemê Firatê û li Hesekê jî qutkirina ava Stesyona Elok ve li ser gelê herêmê şerekî psîkolojîk û qirêj dimeşîne.

Bêguman dewleta tirk ji bo vê rewşê li gor berjewendiyên xwe bi kar bîne ji rewşa aloz a li Rojhilata Navîn sûd werdigre. Ji ber vê yekê ava çemê Firatê wek çekek siyasî li dijî rêvebiriya xweser bi kar tîne. Di encama vê siyaseta qirêj de rêjeya ava ku derbasî Rojava dibe pir kêm bûye. Bi kêmbûna avê re jiyana 4 milyon sivîlên ku herêma Cizîrê dijîn dikeve bin metirsiyekê. Di halê heyî de 83 gund bêav mane û bi hezaran malbat debara xwe bi çandiniyê dikin mexdûr in.

Metirsî û xeteriya rewşa li ber çavan e. Ji ber ku her diçe hewa jî germ dibe bêaviya li herêmê dê bi xwe re nexweşiyan jî bîne. Bi hezaran hektar erdên beyar bê çandinî bimîne. Bi qasî ku bandorê li ser şêniyan bike dê ew qasî bandorê li ser xwezayê bike. Tevî vê jî bêdengiya hêzên navneteweyî dewam dike.

Li gor peymana di sala 1987'an de ku di navbera Sûriye û Tirkiyeyê de hat îmzekirin, divê di saniyakêde 600 metrekup av biherike. Lê ev rêje di rewşa heyî de hatiye 200 metrekupî. Ev jî bi awayekî aşkera radixe ber çavan ku ji sisêyan dû ava Firatê ji aliyê dewleta tirk ve hatiye qutkirin. Di vê mijarê de dewleta tirk xwedî ezmûn e. Berê jî bi heman şêwazê li ser herêmê siyaset reşbîn daye meşandin. Li herêma Til Temirê, ji ber qutkirina avê ji ser çemê Xabûrê û ziwakirina ev bêhtirî 10 sal in êdî çandina ku bi rêya ava çem çêdibû sekiniye. Qutkirina ava çemê Firatê jî bû sedema telefbûna zêdetirî nîvê berhemên avî li herêmên hewza Firatê.


Îro ji ber kêmbûna ava çemê Firatê û nebarîna baranê li herêmê rewşa ne baş e. Bi milyonan kes ji ber polîtîkayên dewleta tirk bi birçîbûnê re rûbirû ne. Tevî ku li gor peymanên navneteweyî yên ku dibêjin 'dewletên cînar wekhev sûd ji avên çem û rûbarên di nav dewletan de diherikin bigirin' jî dewleta tirk di ya xwe de israr dike. Mîna her carê di vê siyasetê de jî dijminatiya kurdan û destdirêjiya li ser destkeftiyên kurdan heye. Dîsa wek her carê ji ber ku mijar kurd e hêzên navneteweyî bêdeng in. Gelê kurd û xwezaya Kurdistanê nekin amûrê siyaseta xwe ya qirêj. Bi van polîtîkayên antî-kurd heya niha we nikarî kurd teslîm bigirin û hûn ê negirin jî. Lewma divê dawî li vê siyaseta qirker bê anîn û Firat azad biherike.

# Cejna we pîroz be!

Bi hêviya ku cejna Remezanê li civaka îslamî ya demokratîk û bi taybetî ji bo gelê me bibe wesîleya xweşî, aramî û rojên xweş û azad. Bi van daxwaz û hêviyan em cejna Remezanê li tevahiya gelê xwe pîroz dikin û dibêjin sibeha we bi xêr, eyda we pîroz be.

SİLOPİ BELEDİYESİ 1960

Hevşaredarên Silopiya û
Endamên Meclisa Şaredariyê



Ji Delav

Feratê Dengizî

# Tehma xwê

Nizanim bi we jî wisa ye, yan na!

Tehma şoriyan cur bi cur e; şoriya tirşiyê, ya sûravkê, ya dew, ya mirtoxê…

Ez ji şoriyê aciz nabim, şorkirina peyv û helwestê ne tê de, ji şîranî, ji tirşî, ji tehlî, ji tûjiyê jî… Ji her cure tehmê hez dikim. Rewşeke awarte!

Lê nizanim çima, cihê tehma xwê ya şoriya wê li cem min cuda ye, bi awayekî derasayî… nizanim hûn çawa nin!

Wexta em zarok bûn, ava behcana tunebû, diya me rûnê nîvhişk an jî sîravk di ser nanê me dida û em dibeziyan lîstikan. Helbet rûnê nîvhişk bi destên her kesî nediket, dima sîravik, lê tehma wê çiqasî xweş bû. Tenê ez vê bibêjim; sîravk, binmayîna kelandina rûnê malê ye, nîvhişk bi xwê tê kelandin, rûnê malê bi ser dikeve, xwê û rûnê binî bi dilînî hevdipêçin nav êdî sîravk e.

Paşê ew ê mirtoxe derkeve, li ser mîrata wî rûnî, lê mirtoxe bi xwelêpêçana ardê qelandî, ji sîravkê vediqete, lê pir dişibin hev, ji aliyê tehmê ve… Ha mirtoxe jî ne hindik e ha… dijbera li hemberî xwe naxwaze, dîlberek wilo nazenîn!

Ez ê serê we biêşînim.

Ku mirov tehma jiyana xwe ranexe berçavan, belkî mirov ji hebûna xwe fêhm neke. Wek ku mirov ji sosyaliya civaka xwe, ji tarîxa malbata xwe ya gelê xwe bi dûr be, dê wisa fêhmkirina hebûnê her tim kêm, bêkes, stûxwar û qels be…

Xwê, têkildarî "*xwe*", "*ruh*","*xwêdan*" "*derûnî*" û "*hebûnê*" ye. Li aliyekî din, bêxwêtî dibe sedema qelsiya hestî û anatomiya candaran û mirovan, dawiyê ku mirov gihaşt û pê ve zêdeya wê xetere ye, yanî xwê ne tiştekî ji rêzê ye.



Îca "*xwê-xwe-xwebûn*" hîmê asasî yê hebûnê ye, masûlkê pişta mirov e ku mirov dike "*xwe*" û dikaribe bi "*xwebûnê*" têkeve nav civak û jiyanê. Yanî bi wê mirov dibe "*kes*" û tev li civakê dibe bi îradeya xwe…

Belê, ez wisa difikirm. Wekî din, neqandin e, bijartin e, tercih e…

Dema ku beden dibetile "*xwê*"ya zêde tavêje tev li avê û dibe "*xwêdan*" mirov rihet dibe, bêhn li mirov fireh dibe. Ê ma tehma xwêya xwêdanê, ew şoriya xwêdanê çiqas xweş û biekl e! Ku xwêdan ji eniya mirov diherike devê mirov, lêv wek ku ji tîbûnê bifilite, wek ku nehne bi qirikê keve. Tew xwêdana bedena yarê ya navbera her du memikan! Hayho..! Tehma xwê wê demê tehma jiyanê ye. De va hişê min çû! Biborin.

Gelo we di qelqija nav rojê de palehî kiriye, palehiya ceh, genim an jî nîskan… geh bi dasa palehiyê, geh bi destan, dest ji moderniteya niha berdin, hebikî herin beriya wê… ku berê dawîn ê selawatan be, kêf kêfa we ye, lewra paleyî diqede û xwêdan wek şirika biharê diherike, ha ev tehma kedê ye. Rewş di her karî de wiha ye, geh li sê compîturê geh di ewrazekî çiyê de, xwêdana bedenê ya kedê afirînereke û tehma di binê zimanê mirov de wek şîraniya bihuştê ye, tehma hebûnê bixwe ye.

Nizam hûn li çol û çiyayan an li mêrg û peyarêyên bajaran meşiyane, belê, mitleq… li pey pez, li pey neqlên qût, an jî karwanek, karwanekî rêdûr, rê çi be, lê dem jî awarteyek e, em bibêjin hûn di taveheyvekê yan jî di bin hûrbaraneke biharî bi refeke gerîla re di meşê de ne! Û meş naqede, nav qolincên we wek Çemê Bûnisra ye, diherike xwêdana ku bedenê sivik dike, diherike û ber bi armancê difirîne. Bêhna vê xwêdanê bêhna evînê ye, naqede, kevn nabe wek parfûm-lewanteya herhebûna abadîne.

Ger we şivanî kiribe, an jî li gund jiyabin hûn ê baş fêhm bikin ku tehma xwêya ser tehtikan ji pez, nexasim ji peza reş re tê çi wateyê û çiqas bi tehm e. Nifşê min destana "*kotan*" an jî wek filma Yilmaz Guney "*Kizilirmak-Karakoyun; Mîha Reş û Çemê Sor*" ku bi ya min hatiye erzankirin, lê wê sahneya ku Şivan bi pez re sê rojan xwêxwêya ziwa dixwar û bendewariya hêviyê pir balkêş e, bi bîr bînin û di derûniya min de zîl daye bûye qorziyek dilê min. Nayê jibîrkirin ku di girtîgehê de em diketin Greva Birçîbûnê û xwarina xwêya ziwa qedexe bû, divê ava şor bihata vexwarin, lê min guh nedida wê ceger parçe bibe, bila parçe parçe bibe, bibe cegera bixwîn-Cegerxwînher û her xwêya ziwa li ser lêvên min bû û bi min pir xweş, mehdê min qet nedixeliya, jixwe ku xwê hindik bihata bikaranîn serêşê mala me xera dikir, nexasim ku "*şîq-mîgren*" hebûya û her bijî cegera min jî piştî sih salî hê wek xwe berê, saxlem. Nizanim çi navî li wê tehmê bikim û bandora girêdana hêviyê hê jî wek evîndarekî xeşîm ku dilê wî çargopal e li benda qîzika bedew û nazenîn e, sorûmor im. Hê ji xwêya ziwa hez dikim heçkû ji gurcikan re ne baş e jî, gurçikên min birîndar in, bi pirsgirêk in, pirgirêkek jî çel salî wêdetir, lê xwe nagirim car carinan wek ku berê xwe bidim evîndarê, wê tehmê diceribînim.

Divêtiya xwê û jiyanê ne hewceyî pênasekirinê ye, lê dixwazim ji bo vê jî çend xalan parve bikim. Li herêma me, tişta herî qenc ku mirov bibe ser ziyaretan nan û xwê ye. Ne ziyaret bi tenê warnî wek nîvpîroz jî wisa. Li cem me "*Kevirê Mîzê*" heye li tenişta rê; mirov an heywanên ku mîz di wan de diesire, diçin sê caran li dora wî kevirî digerin, qaşo çêdibin û nanekî û hinek xwê dixin "*qulek*" wî kevirî, qula wî bilind bû, em zarok bi zorê digihîştinê û her tim nanek û hinek xwê tê de peyda dibû, rêwî yan birçiyan bi wan îdare dikir. Dîsa li tenişta heman rêyê (Rêya Dengiza-Stewrê) li serê girekî kevirekî qul hebû, jê re digotin "*Piyê Şerko*" nizanim çi wateya wê heye, lê her tim nanek û hinek xwê di wir de jî peyda dibû, xwedêgiravî hinekan li ser derdekî xwe ew "*qewl*" dikir. Welhasil xwê û nan pîrozî û hewcedariya pêşîn ên jiyanê ne ligel avê. Îca ev meseleya "*nan-xwê*" ketiye gotinên pêşiyan an jî biwêjan, nexasim ji bo bexîlî û bêwefatiyê tê bikaranîn;

*"filankeso/ê bê "nanxwê" ye",*

*"filankeso/ê bi "nanxwê" ye",*

*"nanxwêya wî/wê li ser çoka wî/wê ye",*

*"ê de lawo nanê me bêxwê ye, kî nanê me dixwe, xerabiyê bi me dike! Qenciyê zû ji bîra dike!"*

*"birînê bi xwê bikewînin!"*

*"min xwê danî ser birîna xwe",*

*"nanû xwêya miriya belavbikin",*

û her wiha…

Di serdema van 40-50 salên dawî de ku wek çalakiyek siyasî "*Greva Birçîbûnê-ya Mirinê*" her dem di rojeva civakê de ye, girtiyên ku ji canê wan pê ve tiştekî ku bidin namîne ku doza mafên xwe yên "*însanî-siyasî*" dikin, dikevin vê rê ye û "*xwê*" her dem li nik avê xala sereke ye ku tê bikaranîn. Tehma wê her dem tehma "*mirin û jiyanê*" ye, nahêle hişê mirov here… her çiqas li qadên bilind ji bo zeîfbûnê û bedenek nazik a lihevhatî wek neyar tê dîtin jî, li vê çalakiyê dosteki qedîm e. Girêdayî vê em şehîdên "14 Tîrmeha 1982'yan" ên Zindana Amedê û herî dawîn parêzer Ebrû Tîmtîk bi bîr tînin ku gihîştin nemirinê.

Min got, 'tehma xwê' li ber dilê min bi her rewşên jiyanê re, wek tehma jiyanê ye; lê em zêde "**şor**" nekin!

# Hêvî çima hewce ye?



Dr. Abdullilah Polat

Hêvî giyanek xweşbîn e ku li ser bingeha hêvîkirina encamên erênî yên der barê bûyer û mercên jiyana mirovan de ye. Aliyên wê yên berevajî depresiyon, bêhêvîtî û bêhêvîbûn e. Li gorî pênaseya Maria Miceli û Cristiano Castelfranchi, hêvî helwesteke psîkolojîk a xwedî armanc û baweriyek e ku tiştek gengaz e. Bi taybetî ji bo kurdan, pir girîng e ku di van deman de bi hêvî yan bê hêvî bijîn.

Hêvî dikare bi bendewariyek neyînî jî çêbibe, dema ku mirov nikaribe bandorê li encamê neke. Bi analîzkirina daneyên li ser 13 hezar kesan, gelek encamên berbiçav derkitine holê. Tenduristiya laşî û derûnî hişmendiyeke mezin a hêviyê ji hin diyardeyan re encaman derdixe holê (wekî nexweşiya kronîk, xetereya penceşêrê û pirsgirêkên xewê). Di heman demê de ew dibe sedema xweşbîniya psîkolojîk (bêtir dilxweşiya jiyanê û wateya jiyanê), encam û tevgera tenduristiya laşî ya baş û stresa psîkolojîk û her wiha hesta başbûna civakî ya baş. Katelyn N.G. ji zanîngeha Harwardê, îspat dike ku li ser baştirkirina tenduristiya laşî, derûnî û civakî ya nifûsa pîr bandorên girîng hene.

**Hêvî ji bo tenduristiyê girîng e**

Hêvî bandorê li tenduristiya giyanî dike û depresiyon û fikarê (nîşanên din ên nexweşiyên giyanî) zêde dike. Hêvî her wiha bi motîvasyona domandina jiyaneke bikalîte ve girêdayî ye. Hêvî li wan bar dike, ew bi tendurist dixwin, hewl didin giraniya xwe di bin kontrolê de bihêlin û xwe-kontrolkirina xwe biparêzin. Hêvî mirovan bi yên din re di têkiliyê de dihêle ji ber ku gava piçek hêrs hebe ew dev ji têkiliyan bernadin. Xwe-kontrol bi taybetî kêrhatî ye ji ber ku xemsariyê asteng dike. Hêvî maneyê dide mirovan. Ew xemgîniyek erênî, kêmtir nîşanên tenduristiya derûnî, temrînek tendurist, xwarin û giraniya tendurist, zêdekirina xwe-kontrolkirinê, têkiliyên civakî yên bi malbat û hevalên xwe re peyda dike.



Erê, dibe ku berevajiyê wê jî rast be. Bêhêvîtî bandor li ser giyan, nîşanên tenduristiya giyanî, berdana werzîşê, xwarin, kontrolkirina kîloyan, xwe-kontrolkirin, beşdarbûna civakî û olê dike. Bêhêvîtî dibe sedema vekişîna ji tişta wateya jiyanê dide. Vê têgihîştinê -ev hêvî bi encamên bitendurist ên erênî re têkildar e- bi kîjan awayan dikare li cîhana rast were sepandin? Hûn ê kîjan stratejiyan pêşkêşî wî/ê kesî/ê bikin ku dixwaze xwe bêtir bi hêvî hîs bike? Girîng e meriv ji bîr neke ku hêvî ne wek xweşbîniyê (optîmîzm) ye. Optîmîzm tê vê wateyê ku tu bi rengekî erênî li encaman hûr dibî. Lêbelê hêvî her gav ne ewle ye ku encam dê erênî be, lê ew mirovan mijûl dike.

**Hêvî ji çend beşan pêk tê?**

Hêvî ji sê beşan pêk tê: xwesteka guherînê, hêza guherînê û bendewarî dema ku em guherînek (domdar) nabînin. Gava ku mirov ji 30'yî heya despêka 60'î bi pirsgirêkek re rû bi rû dimîne, ew piranî li ser astengiyên li derveyî yên li pêşiya wan e. Ji ber vê yekê, nermbûna jêhatîbûn û rêyên çalakiyê ji bo domandina hêviya ku mirovan ber bi pêkanîna armancên wan ve dibe, girîng e. Lê di pîran de gelek astengî nayên çareserkirin. Pirsgirêkên tenduristiyê hene ku ne mimkûn e werin başkirin. Jidestdayîyên mirovên girîng hene. Di tevnên civakî de xeletî hene, nemaze dema ku mirov teqawît dibin û liv û tevgera xwe ya bisînor a ji bo jiyan û xebitandinê ji dest didin. Ji bo ku hûn xwe ragirin û hêvî bikin bêtir hêza we hewce dike. Ango heke ew bawer dikin ku zehmetiyên bibandor nayên çareserkirin jî, ew hewceyî celebek hêviyê ne ku dê bihêle ew li ber xwe bidin. Zanyar dibêjin ku heke nexweşiyek wan a bêderman hebe (mîna parkînson), dema ku dor tê zû nemirin divê ew li ber xwe bidin.

Stratejiyên baş ji bo ragirtina hêviyê başkirina berxwedan û nermbûna derûnî stratejiyên baş in. Wekî din, her ku em pîr dibin, ji me re pêdiviyên hêzê hewce ne ku ji me re bimînin. Vana têkiliyên romantîk ên stabîl, hevalên stabîl û toreyên piştgiriyê û adetên ku me bi laşî çalak dikin diparêzin, lêkolîner wiha dibêjin. Her wiha çalakî û hevgirtina di çarçoveya komeleyan de her dem hêviyê çêdike.

Evîn û rêz...

# 81 bajaran de do rapor bêro weşanayene

Semra Turan

Tirkîya nîmeyê şewa 20ê adara 2021î de Peymana Stenbolî ke qezencanê muhîm ê cinîyan ra ya, pê qerarnameyêk Serekkomarîye xo apey ante. Tirkîya izahê apeyancîyayîşî wina kerde: "Peymana Stenbolî ke sere de hedefê ci teşwîq û girdkerdişê heqê cinîyan o, hetê qismêk kesan ra yena manîpulekerdene û hemcinsîyelî seke çîyêko normalo yena nawitene. Goreyê ercanê malbatî û komelkî yê Tirkîya nîya. Coka ra Tirkîya qerar da ke Peymana Stenbolî ra apey ancîya." Qerarî ra dima xeylê nêrazîbîyayîşî virazîyayî û cinî vatî ke ê 'Qerar nêşinasnenê', 'Peymana Stenbolî ê ma ya û ma do fek vera nêdî' û talebanê xo her cayê welatî de ardî ziwan. Çalakîya cinîyan her roje hîna gird bî û xeylê welatan de çalakîyê paştîdayîşî virazîyayî.

Xoverdayîşê cinîyan pêroyê welat girewt binê tesîrê xo û qerarê qedîyayîşê 'Peymana Konseya Ewropa ya Derheqê Têkoşînê Vera Şîdetê Serê Cinîyan û Şîdetê Zereyê Keyeyî' ya ke sey Peymana Stenbolî şinasîyena şewa 30ê Nîsane de Rojnameyê Fermî de weşanîyaye ke do peymane 1ê temmuze de biqedîya. Pêroyê qerarî demê qedexeyan de nîmeyê şewe de ameyî girewtene. Na rewşe rojeva rayaumûmîye bedilna û peymana ke serra 2011î de ame îmzakerdene hetê qismêk kesan ra ame hedefgirewtene û zext serê îqtîdarî kerdî ke peymane wedarno.

Îqtîdaro ke mesuldarîya ci esto ke pêroyê maddeyanê pêkerdişî bîyaro ca, mîyanê 10 serrî de maddeyêk daxî nêard ca û îdîa kerd ke pêkerdiş timî zerar daya. Camêrd eşkerayî û qerarê apeyancîyayîşê peymane ê îqtîdarî ra hêz girewt û rojêk de 4 cinîyan qetil kerd. Dima ra şîdet roj bi roje zêdîya. Goreyê dayeyanê Platformê Ma do Qetilkerdişê Cinîyan Bivindarnî aşma Nîsane de tewr tay 16 cinî ameyî qetilkerdene û 14 mergê şikin ê cinîyan virazîyayî.

Peymane şîdetê vera cinîyan sey binpaykerdişê heqan û cîyaye bi name kena û çi tesadufo ke qerarê apeyancîyayîşî raştê wextê hadrekerdişê paketê Heqê Merdiman ame. Xora babeta nizdîbîyayîşê vera cinîyan û komelî ra îzolekerdişê cinîyan timî rojeva munaqeşeyan bî. Herînayîşê nê qeraran munaqeşeyan zêdîna. Apeyancîyayîşî de tewr zêde bahaneya 'malbatî' ameye nîqaşkerdene. Cinî tewr zêde keyeyê ci de hetê camêrdê ke ci reyde zewecnaye bî ra ameye qetilkerdene.

Rojanê peyênan de semedê wedarnayîşê Qanûnê Pawitişî yê 6284î ke cinîyanê ke maruzê şîdetî benê nêpaweno reaksîyonî virazîyayî. Îqtîdaro ke Peymana Stenbolî fesih kerd, na reye qanûnê 6284î hedef girewt. Cinî vera nê kerdişan raşteyan nêteriknayî û serê medyaya komelkî de zî aktîvîteyan viraşt. Cinî hetê betalkerdişê qeraran û caardişê maddeyan ê peymane de bi israr î.

Serrgêra 10. ê Peymana Stenbolî ke binê hêrişan de ya 11ê Gulane de ya. Cinî semedê na roje raporêk hadre kerdî û do bi sernameyê "10 serran de se bî? Qerarê fesihkerdişî çi tesîr viraşt?" 81 bajaran de eşkerayî bidî. Serrgêra peymane raştê wextê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan yena. Cinî do apey vinderî? Cewabê persî têkoşînê cinîyan de yo. Cinîya ke her roje raştê şîdet û hêrişan yena, qerardara ke siqaqan ra fek vera nêda.




# Rojeva Tirkîya sero çend qalî

Murat Kan

Rojeva welat pir hest a. Yew hetî ra operasyonî estê, yew hetî ra zî grevê vêşanîye yê zîndanan dewam keno. Ti destê xo berzî kam hete barê çizî yena. Na mesele epeyê yew wexto rojeva ma meşxul kena. Cuye de tehm nêmendo. Roj nêwîyarena ke yew meseleya newa vecîyena. Hem psîkolojîyê komelî hem zî psîkolojîyê şexsan herimîyayo. Hindayê merdimî xelisîyayîşê xo, xo kiştiş de vînenê. Ma senî hewa ameye na dahkara. Kam ma erdî na darax. Komel de ma kamî ra bipersî şêno na babet de çend qalan vajo. Ez bawer kena ke embazê ke no nuşte wanenê ê zî na babete de eşkenê çend risteyan bîyarî têhet, çend rîpel nuşte binusê. Hema oncîna ez wazena na dahkara da çend qala vaja.

Mesela tûk û tena meselaya qatê (çin) serdestî ya Tirkîya nîya. Ma na dahkara da barê hêzanê moderniteya kapîtalîst fehm nêke se ma kewenê yew xeletîyêka pîle. Nê sebebî ra ganî ma rewşa welatî de rolê serdestanê Tirkîya, barê hêzanê moderniteya kapîtalîst bizanê.

Operasyonê ke welatê ma de benê ra merdim fehm keno ke krîzê moderniteya kapîtalîstî ra dûrî nîyo. Çunke nê hêzî yew krîzê pîlî ra vîrenê. No krîz tûk û tena hêtê lejkerî yan zî debar de nîyo. Nê warî ra teber hetê komel, hetê sîyaset, hetê ciwîyayîş, hetê çand (kultur-ramitiş) de zî ma nê krîzî ra parçeyan vînenê. Ona ke kesayetîya nê hêzan bedilîyaya. Oyo ke bînek sîyaset ra fehm keno, nuqtaya xo ra ewnîyeno. Ma na dahkara da vajê se kesayetîya kolonyalîstan bedilîyaya zaf zî xelet nêbena. Hetê bînî ra pergalê kolonyalîstan hîna xorîn bîyo. Peroyê dinya kewta destê nê hêzan. Nê hêzî kenê ke no krîz şaranê dinya ser o bêro çareserkerdiş. Hema no krîz hinday krîzêk awankerdeyo hêzê kapîtalîzmî nêeşkenê dey rê çare bivînê. Na semed ra ge-ge kewenê, ge-ge zî gale kenê şaran sero. Derd û amancê înan dewamkerdişê pergalî yo. Semedê armancê xo çi înan dest ra yeno texsîr nêkenê. Qîrkerdiş, kiştiş, kolonyalîstî bîyê karê înan ê verênî. Çunke pergal ameyoxê xo ewte de vîneno. Çiqas şer, hêndayê kolonyalîstî, no bîyo felsefeyê înan. Semedê amancê xo komel lete lete kerdo. Hema zî nêeşkayê ercanê komelî çin bikerê. Komel semedê nê ercanê xo hema zî payrayo. Xo ver dano.

Hêzê kapîtalîstî xoverdayîşê komelî qabul nêkenê. Na semed ra yew hetî ra galê kenê komel ser o, yew hetî ra zî fenanê neweyan gêrenê. Çinara? Çunke nê hêzî zanê ke na mesela êdî bi metodanê verênan nîna çareserkerdene. Sere de DYA û hêzê Ewropayî na dahkare de seyyewbînan fikirîyenê. Derdê înan rîyê moderntaya kapîtalîst cîla (sîqal) bikerê. Na semed ra hema zî paşt danê Tirkîya. Ê zî zanê ke meseleya na cografyaye de berpirsîyar Tirkîya ya. Tirkîya wazena ke Kurdan qetil bikera û bikişa. Nê hêzî zî amancê Tirkîya zanê. Oncina çinara paşt danê na degulê Tirkîya. Çunke çixarê nê hêzan no gure de esto. Herkes zano ke no îqtîdar Kurdan rê dişmenî keno. Wextê xo de Trump zî wina vatêne. Ewro Biden zî vano. Herkes derheqê Erdoganî de zî qalan keno, derheqê Tirkîya de zî qalan keno. Hema hetê îcraatî de çewêk (kesêk) destê xo nêleqneno. Herkes zano ke waxtê berjewendîyê nê hêzan bêro pîyê xo dahî nêşinasnenê. Na semed ra ê zî zanê ke no îqtîdar serê înan rê zî bela yo. Hema karê înan nê îqtîdarî reyde nêqedîyayo. Îqtîdar, heta ke karê nê hêzan rê bibo, înan reyde berjewendîyê xo şixulneno. No îqtîdar zî karê nê hêzan vîneno. Zano ke heta ke berjewendî vajene, sewbina yew dahkara nêano rojeva serdestan. Na semed ra no îqtîdar zere de û teber de zî zaf zeîf kewto. Hema oncîna paşt danê bide. No îqtîdar zî tay wete de paşt dano nê hêzan. Heta înan dest ra bêro na paşt zî dewam kena. Na semed se kerd; sere de çend gamê polîtîkî eştî yan zî xo bi nê hewayî nawit nê hêzan. Zanayêne ke hêzê moderniteya kapîtalîstî ci zaf rexne kenê. Nê halê winasî zî qabul nêkene. Hema teda hetê nê hêzî yo. Sistbîyayîşê Tirkîya ameyêne karê DYA û Ewropa zî. Çinara? Çunke nê hêzî zanayêne ke Tirkîya na rewşe de zaf aver nêşona. Tirkîya ke binêk sistbîye, nê hêzî reyna polîtîkaya xo ya wertakî vernayene. Na semed ra hêzê ke ge-ge hetê demokrasî û azadî ra polîtîkaya Tirkîya rexne kenê, oncîna paştî danê kiştişê Kurdan. No dem de meseleya verênemeseleya Kurdan a. Hema no îqtîdar çareserkerdişê na meselaye ra zaf dûrî yo. Îqtîdar dewamkerdişê îqtîdarîya xo hina zaf qîrkerdiş, hina zaf kiştişê Kurdan de vîneno. Na semed ra zere de û teber de operasyonan keno. Yew hetî ra keno ke qîrkerdişê Kurdan û operasyonan sero rayanê xo vêş bikero. Zano ke no hewa nêeşkeno zêde dewam bikero. Hetêk ra operasyonan keno ke Başurê Kurdistan bigêro binê kontrolê xo û yew hetî ra zî destkewteyanê Kurdan apey bigêro. Na dahkara piyabestiya operasyon ke teber de verba gerîla bena serkewtiş ayayo. Hema heta ewro nêeşkayê na dahkara sere berê. Na nuqta zaf avzel û girîng a. Nê operasyonî heta ke nêşerê sere no îqtîdar zî zere û teber de vateyanê xo nêeşkeno bero sere. Hema yew waxto zafê mûhim ra ma vîyarenê. Heta rayber xover bido Kurdî hetê asayîşî ra rehet ê, hema ganî ma na proses rind temaşe bikerê û yew hetî ra hetê netewî ra çi keweno ma ser ma bîyarê ca. Ma na vîr de nêbî se ganî ma bîzanê ke peynîya nê operasyonan modêlê Srî Lanka yo.



## Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

## Tewirê şîdetî

Sernameyê ma "Tewirê Şîdetî" yo. Pers no yo: Tewirê şîdetî zî estê? Bersiv erê yo. Berê, ma henî qal bikerê.

Aşmey 11'inan ya serra 2018'inan de Fransa de protestoyan dest pêkerd. Şarî, yêlegê zerdî day bî xo ra û kewtîbî kuçeyan. Hikumetê Fransa serra 2008'inan de biryar dabî ke her kes mecbûr o yêleganê zerdan ke bereqênê bikerê zerey erebeyanê xo; qeybî qeza yan çiyo aneyîn de go lazimî bê. Şarî zî ê yêlegî girotî û protestoyan de day xo ra. Semedê ene joy nameyê çalakî zey "Çalakîya Yêlegzerdan" dinya de bî vila. Înan çalakî de waştê baca (vergî) ardû û mazotî kemîkerê, biryarê bace serwetî ya ke serra 2017'inan de hamiya girewtişî bêro betalkerdiş, hikumetê Macronî îstîfa bikero û çiyê aneyînî. Çalakiyan de şîdet zî veciya meydan û tewirê şîdetî hamey nîqaşkerdiş.

Derhêner David Dufresne belgefîlm anto serê na çalakî û şîdeto tede. Nameyê belgefîlmî "The Monopoly of Violence" ("Serdestiyey Şîdetî", bi tirkî kerdo "Şîdet Tekelî") yo. Wexto ke "Yêlegzerdan" çalakî kerdêne şîdet vecîya meydan. Hetê ke ro polîsan hêrîşê çalakkaran kerd, heto bîn ro çalakkaran ra heniyan cay şikitêne, tar û mar kerdêne. Bi aweyke şîdet vecîyabî meydan. Derhêner Dufresne serê vatişê ramanwerê alman Maks Weber ra hereket kerdo. Weber vano, "Tekane quweto ke serdestîya şîdeto meşrû dest de yo, dewlete bi xo ya." Ê no het ro mesela girewta dest û verê xo dayo ka şîdet çi yo, kamî ra vecêno û encamê ci çiyê.

Çarçaweya Festîvala Fîlman ya Stenbolî ya 40'inan de belgefîlm hame mojnayîş. Merdim heta peynî ro belgefîlm goştarî keno, çalakîyê Yêlegzerdan, hêrîş yan zî vernîrogirewtişê polîsan vecêno verê temaşevanan. Û her ke dîmenêke yena, jo serê a dîmene ra xeberî dano/a. Belgefîlm bi teknîkêk xisûsî hamewo antişî ke temaşevan nêzano/a a/ê kam a/ê. Dima ra ke belgefîlm qedêno ma vînenê ê ke xeberî dayê parêzer, akademîsyen, raportorê Neteweyanê Yewbîyîn, rojnameger, nûnerê sendîkaya polîsan, henî mexdûrê şîdetî yê...

Û persey ma ke belgefîlm de zî yena nîqaşkerdin yena meydan: Tewirê şîdetî estê? Ma serê nê erdan de vînawo ke perodayîn, kiştiş şîdet o. La belgefîlm tewiranê bînan ê şîdetî mojneno ro ma. Xizmêkey Yêlegzerdan ra ana vana:

"Eke ez nêşkî debarey xo bikerî, no şîdet o."

"Serokomar yeno xeberî dano, çiyan rast nêvano, zûran keno, no şîdet o."

"Ez xo aramî de hîs nêkena, zor danê ma ser, ma zey xo qebûl nêkenê, no şîdet o."...

Ma nê nimûneyan ra zî vînenê ke tewirê şîdetî estê, şîdet tenî ew çî nîyo ke ti wirzê ro joyro dê. Zûrekerdin zî şîdet o, merdim endêke kar bikero û nêşko debarey xo bikero zî şîdet o. Çîkew bîn zî ma vînenê ke welatê raver şîyayeyî eşkenê serokomarê xo ra vacê "Ti zûran kenê" û çîke bi înan nêbeno. Belgefîlm de "Gere polîsî hetê kamî bigîrê" û "şîdet bişixulnê yan nê" zî yeno nîqaşkerdin.

Belgefîlm hem meseleya Yêlegzerdan hem zî nê hetan ro henî asoyanê newan mojneno ma. Ger şima cayke rastê nê belgefîlmî hameyî seyr bikerêne.

# Cejna we pîroz be!

Em cejna Remezanê li gelê xwe pîroz dikin;
bi hêviya em gelek cejnên bi tenduristiyeke baş, aştî,
aramî û xwişk û biratiyê bibînin.

Serokê Şaredariya Çinarê Bedrî Kaya û
Endamên Meclisa Şaredariyê

# Cejna we pîroz be!

Em Roja Dayikan li tevahiya dayikên kurd û dayikên
cîhanê û her wiha cejna Remezanê jî li gelê kurd û
tevahiya civaka îslamî pîroz dikin.

Dayikên Aştiyê

# 'Hozan Mizgîn bîra nifşên îro ye jî'

Bêrîvan Kayi

Nifşên li ber stranên Mizgîn mezin bûn nifşên salên 80 û 90'î bûn. Gelek jinên ciwan bi rênîşandayîna Mizgînê tev li têkoşîn û xebatên çand û hunerê bûn. Îro bi sedan zarokên kurd bi navê Mizgîn tên nasîn. Stranên wê hê jî li ser zimanan e

Di salên 90'î de nifşek li ber stranên Koma Berxwedan û Hozan Mizgîn mezin bûn. Li bakurê Kurdistanê di salên 90'î de di her malekê de û li ber her teybekê ji bandên Koma Dengê Azadî, Koma Agirê Jiyan, Koma Amed û Koma Berxwedan hebûn. Gelo çend dayik bandên van komê muzîkê bi bo ku nekevin destê leşkeran vedişartin. Di bîra me gelekan de heye, dema ku dê leşkeran biavêta ser gund, veşartina van bandên ku di qupik, qelşên dîwar an jî li hevşiyên pez de. Belê bîra me kurdan bi mînakên wisa tije ye û yek ji vî dengê ku êdî bûye bingeha hunera kurdî jî dengê Hozan Mizgîn e.

Têkildarî huner û stranbêjiya Hozan Mizgîn em bi yek ji damezrînerên Koma Berxwedan bi Hozan Seyîdxan re axivîn.

Di destpêka axaftina xwe de Seyîdxan qala çand û hunera salên 80'yî kir û wiha got: "Wê demê seranser bin jî xebatên me yên hunerî hebûn. Ji sala 79'an heta 80, 81 û 82'yan weke komeke biçûk em çend heval li gel hev bûn. Hinek çalakiyên weke çandê yan jî weke pîrozbahiyên cejnên Newrozê em dihatin cem hev. Heta sala 82'yan wisa dewam kir. Lê fermiyeteke bi navê sazîbûnê tune bû. Bêguman ew însanan jî hinekî bi hestên niştimanî nêzî çandê dibûn. Li ser vê bingehê perspektîfeke me ya sazîbûneke baş neketibû rojevê. Lê pratîk amator be jî me xebatên xwe yên çandî û hunerî dikirin."

**Tevlîbûna qada hunerê**

Seyîdxan bal kişand ser nasîna xwe ya bi Hozan Mizgîn re û destnîşan kir ku Mizgîn di sala 1982'an de tev li xebata wan bûye û ev tişt anî ziman: "Hevala Mizgîn weke hunermendeke erkdar hat. Bi hatina hevala Mizgîn re hinekî şêwaza xebatên me guherî. Hinek rê û rêbazên ku êdî em ê çawa bikaribin bi rêya çand û hunera kurdî ji bo kurdên li diasporayê bibin bersiv ket rojeva me. Her wiha em ê çawa bikaribin pêşî li asîmîlasyonê bigirin an jî xwedî li nirxên çand û hunerî derkevin bi hatina hevala Mizgîn re şêwaza rêxistinbûnê derket. Di heman demê de weke jineke kurd pir zehmetiyên wê serdemê jî hebûn bi erkeke niştimanî têkeve nav tevgera azadiyê. Kesayeta Mizgîn ji bo me bi serê xwe raperînek bû."

**Hatina Mizgîn û Sefkan**

Di berdewama axaftina xwe de Seyîdxan destnîşan kir ku bi hatina Mizgîn û Sefkan re avakirina Koma Berxwedanê ketiye rojeva wan û wiha pê de çû: "Tabî di vir de weke jinek rola heval Mizgîn sereke bû. Heval Mizgîn bi hatina xwe re ji jinan re bû moral û bû wesîleya tevlîbûna jinan a qada çand û hunerê. Bi rastî jî xwedî rol û kesayeteke bêhempa bû. Di qada çand û hunerê de rola hevala Mizgîn roleke sereke bû. Dengxweş bû û stranên gelêrî û şoreşgerî hez dikir. Berhemên xwe bi xwe diafirandin û bi koma xwe re parve dikir. Bawer bikin bi dehan jinên ciwan ji ber dengê wê ji ber helbest, stran, sekina wê ya xweîfadekirinê tev li xebatên me yên çand û hunerê yên Ewropayê bûn."

**Xwedî nirxên civakî bû**

Hozan Seyîdxan wiha qala hin bîranên xwe yên bi Hozan Mizgîn re kir: "Bi heval Mizgîn re bîranîna me ya herî baş rêhevaltî û nêzikatiya wê, ferqnexistina navbera jin û mêran û di vê rêbazê de tu carê bêyî hevalên xwe erka xwe bi tena serê xwe takekesî bi rê ve nebir. Bîranîna herî pak ew bû ku bi moral û coş bû. Heta dawî mutewazî bû, heta dawî gelêrî bû, hestên civakê baş nas dikirin, pênase dikir û nêzîkatiyên wê tim ên serkeftî bûn. Ji bo me jî bîranîna wê ya herî sereke nêzîkatiya wê ya li nirxên civakê û nirxên têkoşînê bûn. Wê ev hestên xwe hem li ser dikê hem jî di pratîka xwe de bi me re parve dikir."



**Piştî çûyîna Mizgînê**

Seyîdxan bal kişand ser şehadeta Mizgîn û wiha domand: "Helbet çûyîna hevala Mizgîn ji bo me jî xemgîniyeke din bû. Ew hem endameke civakî bû hem endameke şoreşger bû û hem endameke birêvebirina xebatên siyasî jî bû. Xwedî sekneke wisa bû. Weke jineke kurd têr û tije bû û bi rastî jî mirov jê feyzê digirt. Ji xebatê heta sekna wê xwedî nirxên neteweyî bû."

**Bandora Mizgîn a li ser nifşekê**

Her wiha Seyîdxan bal kişand ser bandora dengê Mizgînê yê li ser nifşên nû û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Nifşên li ber stranên hevala Mizgîn mezin bûn nifşên salên 80 û 90'î bûn. Gelek jinên ciwan bi rênîşandana Mizgînê tev li têkoşîn û xebatên çand û hunerê bûn. Îro bi sedan zarokên kurd bi navê Mizgîn tên nasîn. Stranên wê hê jî li ser zimanan e û di bîra nîfşên îro de ye. Bawer bikin li ber van nirxên wê, li ber dengê wê, li helwesta wê, sekna wê nifş mezin bûne. Çavên me hê jî li hevala Mizgîn digere. Ji ber ku ew pêşengeke vê xebatê bû.

Ez di salvegera şehadeta wê de bejna xwe li ber şehadeta wê ditewînim û bi rêzdarî bi bîr tînim."

# Her çand li bejn û bala xwediyê xwe tê

Mîrza Ronî

Dema mijar çand be, barê nivîsandin û ramandinê jî giran dibe, ji ber ku têgeha çandê di nav xwe de gelek wateyan dihebîne. Di vê nivîsara xwe de, ez ê hewl bidim çend wateyên çandê rave bikim û balê bikişînim ser çandkujiya ku niha di nav civakê de bi pêş dikeve.

Belê van rojan dema rewşa guharîna civakî li ber çavên xwe diwezinînim; çend 'deqên' li ber çavên min dikevin; çandkujiya ku bi pêş dikeve li pêşber çavan beloq dike!

Çand wekî têgîneke sereke gelek wateyan di nav xwe de dihebîne. Mînak çand maka ziman e. Dîsa çand maka perwerdekariyê ye. Dema kesekî xweşbîn û nefsbiçûk hebe ji wî kesî re dibêjin; filankes kesekî çandbîn e, perwerde dîtiye! Ango di çandê de gelek têgehên têrwate hene.

Çand bixwe; wateya xwe ji zimanê Arî (binemala kurdî) digire û ji peyva 'çand-inî'yê derketiye. Wekî tê zanîn cara pêşî çandinî di serdema Neolotîkê (B.Z 12.000) de li ser axa Mezopotamyayê bi pêş ketiye û belavî erdnîgariyên din bûye. Ji wê çendê peyva çandê peyveke vê axê ye û wateya xwe ji çandiniya vê axê girtiye. Bi gotineke din wekî kelepor jî tê bikaranîn. Bi zimanê almanî 'kultur' jê re tê gotin û bi zimanê tirkî jî wekî almanî tê bikaranîn. Wekî ku mirov ji wateya peyvê jî fêm dike çand peveke dewlmend e û bi wateya xwe her tim di dîrokê de bûye mijara nirxandinê. Her wiha awirên siyaseta pergalên desthilatdariyê jî her û her li ser çandê ye! Di nav civakan de teşegirtina çandê barê siyseta birêvebirinê diyar dike. Ji wê çendê civakeke xwedî çand; di nav lepê siyasetê de zûka kedî nabe! Bandora çandê di destê kê de be ew dibe xwedî bandor!

Bo ku girîngiya çandê were fêmkirin dixwazim gotina wezîrê serdema faşîzma Adolf Hîtler Joseph Goebbels bînim bîra we. Goebbels di axaftineke xwe de dibêje: "Dema peyva 'çandê' dibihîzim destê xwe diavêjim demanca xwe!'' ji vê gotinê jî tê fêmkirin ku ji gelan re çand xwedî wate û bandoreke girîng e!

Çawa ku em ji ziman re dibêjin; "ziman hebûn e'' a rast maka hebûnê çand e! Dema kesek li çanda xwe xwedî derdikeve di heman demê de li xwe, li ziman û dîroka xwe jî xwedî derdikeve. Ji mirov re çand her tişt e. Di vê serdemê de her çiqas wateyên çandê hatibin belavkirin jî di rastiyê de her civak pêwîste li gorî çanda xwe tevbigere. Ango kesekî faris dê li gorî çanda xwe bijî û kesekî kurd jî dê li gorî çanda xwe bijî. Ne çanda farisan ji ya kurdan mezintir e, ne jî çanda kurdan ji ya farisan. Her çand li bejn û bala xwediyê xwe tê. Lê mixabin siyaseta serdestan çavek din li çandê dinêrin û çanda serdestan mezin dikin û çandên din tune dihesibînin. Mînaka tunekirina çanda kurdan li holê ye! Bi salan e çanda kurdan di nav dorpeça qirkirinê de li ber xwe dide. Berî her tiştî zimanê kurdî hat qedexekirin û hebûna kurdan tune hat hesibandin. Bi demê re çi çanda kurdan hebe hêdî hêdî di nav çerxa qirkirinê de hat ber rewşa helandinê û heta roja me ya îro jî qirkirina çandê didome.

Bi taybetî di van çend salên dawî de dorpeça li ser çanda kurdan formata xwe veguherandiye çandkujiyeke xefikî! Rewşek sosret heye ku êdî kurd xwe bixwe ji hin guharînên çanda xwe re çavê xwe dineqînin. Çawa ku di nav kurdan de xwepişaftin heye, bi heman awayî ji çandkujiyê re jî çav niqandin heye. Gelek arîşeyên ku çanda me diguherînin bi pêş dikevin. Rewşa çandperestiya me bûye wekî mînaka beqê! Gelek kes hene qirkirina çanda xwe wekî bûyereke ji rêzê dibînin û roj nîvê rojê çanda wî li pêş çavên wî tê kuştin lê qet xwe nalebitîne jî!

Meseleya beqê ji kesên xwekuj re hatiye gotin. Dibêjin dema ku tu beqekê bikî nav beroşek avê û tu hêdî hêdî agir di bin beroşê de bikî, dê beq cihê xwe xweş bike û heta bimire jî xwe nalebitîne. Lê dibêjin heman beqê tu bavêjî nav beroşeke ku ava wê gelek germ e, wê demê dê beq li xwe bihese ku dê di beroşê de bimire û xwe ji beroşê bavêje derve. Çandkujiya niha dibe jî wekî beqa di beroşê de ye ku agirê wê hêdî hêdî avê germ dike. Guhartinên ku di nav civaka me de dibin jî hêdî hêdî çanda me dikujin û vediguherîne çanda serdestan an jî evîndariya çanda populîst. Ji rewşenbîr, nivîskarên kurd em bigirin heta siyasetmedarên kurd gunehkarên vê rewşa çandkujiyê ne.

Ka ez bi çend mînakan vê rewşa çandkuj piştrast û berbiçav bikim. Wekî ku min li jor jî bal kişand ser wateya çandê; çand ji civakan re xwedî gelek teybetmendî ye. Ji gelek dan û standinên civakî re çand tê gotin. Mînak di nav çanda kurdan de çanda dawetan heye, ango dema jinek û merek bi hev re biryara zewacê didin vê biryarê bi dawetekê pîroz dikin û şertê çanda xwe tînin cih. Di çanda kurdan de şert û mercên dawetê cihekî mezin di. Lê ev çend sal in hêdî hîdî çanda dawetan li nav kurdan diguhere. Dawetên me jî êdî vediguherin wekî dawetên çanda populîst. Gelek jin dema dibin bûk û gelek mêr jî dema dibin zava li gorî çanda popîlîst dawetekê dihizirin û ne li gorî çanda xwe tevdigerin. Mînak, berî niha navê 'gelînlîk' ê bûka bi kurdî; 'qezî' (li herema Cizîrê) bû. Gelo kîjan bûk êdî qezî li xwe dike. An jî kîjan bûk û zava di dawetê de êdî cilên kurdî li xwe dike. Berî niha dawetên kurdan sê rojan li cihekî vekirî dihatin kirin û rengê dawetan tenê kurdî bû. Ciwanan govend bi stranên gelerî digerandin. Lê mixabin niha dawet bûne çend saetek û di salonên dawetan de tên kirin, bi rengê çandeke din. Bi awayekî berbiçav diyar e ku çanda dawetên me guheriye û bûye çandeke din.

Dîsa mînakek din jî heye ku li ber çavên min dikeve sosretiyek çandkuj e. Di nav hemû civakan de çand û ehlaqê şîn girtinê heye. Ango dema kesek di mire hezkirî û mirovên wî kesî şîna wî digirin û wî oxir dikin. Ev çanda şîngirtinê di nav me kurdan de jî çandeke girîng e û cihê wê taybet e. Lê mixabin ev çanda şîngirtinê jî di nav kurdan de êdî ne wekî berê tê dîtin. Wateya şînê jî di nav civaka me de hatiye guhertin. Berî niha dema kurdekî jiyana xwe ji dest dida malbat, xwediyên wî/wê her tiştên xwe dirawestandin û şîna miriyê xwe girê didan. Çend rojan ser û cilên xwe nedişûştin. Dîsa çend rojan televîzyon, radyo û hwd. temaşe û guhdarî nedikirin. Di gundekî de şîn hebûya di wî gundî de her kesî rêz li şînê digirt û li gorî çanda şînê tevdigeriyan. Her kesî piştgirî dida xwediyê şînê heta şîna wan xilas dibû. Lê mixabin niha hêj taze sê rojên şînê xilas nebûye gelek kes hene li gorî ehlaq û çanda şînê tevnagerin û li karê xwe dinêrin. Jixwe êdî çanda şîngirtinê derbasî înternetê bûye û li ser tevna civakî sersaxiya şînê tê xwestin. Berbiçav tê dîtin ku êdî çand û ehlaqê şînê jî wateyên xwe ji dest dane.

Bi çandê ve girêdayî çend deqên ku ehlaqên civakî ne di vê serdemê de ji wateya xwe dûr ketine; berî niha çandeke kurdan a xwerû û paqij hebû lê mixabin di gelek waran de êdî çanda kurdan di nav dorpeça çandkujiyê de maye û heke hişmendiya çandparastina xurt bi pêş nekeve dê divê serdema post-dîjîtal de çanda me ji dest dide. Kanî ew rojên ku dema dayikan nan tenûrê dipehtin kesek di ber tenûra wan re biçûya dê teqez nanekî tenûrê ji bo xwarinê bidana wî kesî. Mixabin û sed mixabin niha çanda manewî li ber mirinê ye û çanda berjewedîperest jî bûye mode. Di avahiyên betonî de her kes li mala xwe ji xwe razî dijî û mala cîranê wî/wê li ber şapê here jî haya wan jê çênabe!

xwebûn

10-16 Gulan 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 73

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Bajarê ji artêşa 10 Hezaran re bû rêber: Zaxo



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Bi komployeke navxweyî Beriya Zayînê (B.Z) di sala 549'an de, hukumdarî ji destê Medan derketibû û ketibû destê Persan. Ev rewşa hanê gelekî li zora Lîdyayiyên dostên Medan çûbû. Lîdyayî, dixwazin tola dostên xwe yên Med, ji Persan bistînin. Lê di qada şer de, tiştekî kesnedîtî diqewime û hespên Lîdyayiyan, ji ber deve/hêştirên Persan ditirsin û hespên wan li qada cengê diqutifin. Bextê Persan cara duyemîn lê dixe. Piştî împaratoriya Medan, hukumdariya Lîdyayê jî dikeve bin darê Persan. Hem Ekbatana paytexta Medan, hem jî Sardes (Salihliya Manîsayê) paytexta Lîdyayê dikeve destê Persan. Bi vî awayî, Pers li ser gencîneya du welatên pir dewlemend rûdinên.

Derdora sed 50 sal di ser re derbas dibe. Darayê 2'yemîn dimire. Kurê wî yê mezin, Artakserkses/Erdeşêr derdikeve ser text. Di vê navberê de Kroş ê birayê piçûk jî hingê hukumdarê rojavayê împaratoriya Persan bûye. Her du mîrza, ji bo textê hukumdariyê li hev nakin. Diyar e ev nakokiya di navbera her du birayan de, li xweşa Lîdyayiyan jî diçe. Lîdyayî, ji bo nakokiya di navbera her du mîrzayên bira kûrtir bikin, Kroşê birayê piçûk dicixirîne û wî sîr dike.

Kroş jî radibe artêşek ji gelê herêmê ku ji deh hezar leşker pêk tê, kom dike. Ev artêşeke bi meaş/mûçe bûye û bi vê artêşê dajo ser birayê xwe yê mezin. Ksenefon ê şagirtê Sokrates jî di nav vê artêşê de cih distîne.

Kroş, li gel artêşa 10 hezaran ji Sardesê bi rê dikevin û di ser Frîgya, Îkonya, Kapadokya, Klîkya, Antakya, Efrîna îro û berûberê çemê Ferêt tê xwe digihîne heta Babîlyonê. Li vê derê Kroş dikeve kemîna birayê xwe û tê kuştin. Artêş dimîne bê fermandar.

Leşker tevdek bi zîrekiya Ksenefon bawer in. Ksenefon dibe serfermandarê artêşa 10 hezaran. Ksenefon ji xwe re dike armanc, bê şer û pevçûn wan leşkeran bi sax û silametî bigihîne dê û bavên wan.

**Welatê kardoxiyan**

Li vegerê li gundîyekî Kardûkî/Kardoxî rast tê. Riya bi bisteh, ango riya ewledar ji wî gundiyê Kardoxî dipirsin. Gundiyê kardoxî, çiyayê Zagrosan raberî Ksenefon dike û dibêje: "Ev çiyayê hanê welatê kardoxiyan e. Ew neyarên persan in. Wextekê berê Persan, artêşeke ji 120 hezar kesî pêk dihat şand ser Kardoxiyan. Lê ji wî 120 hezar leşkerî, yek bi tenê jî sax venegerya. Kardoxiyan ew tevdek kuştin…"

Ksenefon bi ya wî gundiyê kardoxî dike û xwe li çiyayê Zagrosê dixîne. Hefteyekê pê de di nav welatê kardoxiyan re derbas dibe. Lê kardoxiyên di nav Zagrosan de, bi kevkaniyên xwe yên koçerî, bi tîrên xwe yên ji darê Benav/Reşdar, Ksenefon û leşkerên wî tibabekî şerpeze dikin. Heta kardoxî pê dihesin ku ev artêşa nîzamî ne artêşa talan û dagirkeriyê ye, malikê li Ksenefon û artêşa wî diviritînin.

Diyar e ku hingê jî pêşiyên me yên kardoxî, ji şerê gerîlatiyê re serwext bûne. Lema Ksenefon dibêje: Kardoxî, bi komikên piçûk derdiket li serê çiyayên bilind. Bi agir û dixanê peyam ji hev re dişandin, dikirin lîrelîr. Bi stran û reqsê şer dikirin û xunava kevir û tîran bi ser me de dibarand. Tîrên wan ew çend dijwar bûn, mertalên me yên hesinî qul dikirin û derbas dibûn. Bi vî awayî li leşkeran diketin û ew dikuştin…"



Artêşa Ksenefon heta ji erdnîgara kardoxiyan derbas dibin, sê hezar kuştî li dû xwe dihêle û firtêfirtê xwe digihîne Deryaya Reş. Paşê berhema xwe ya nemir a bi navê Anabasîs (rapelikîna bi çiyayan ve) dinivîse.

Gelo kî dikare bibêje ew gundiyê riya rast raberî Ksenefon kiriye, ne gundiyekî herêma Zaxoya îro ye? Û ez jî niha li Zaxoya li binetara çiyayê Zagrosê me. Her wiha rêberekî min jî heye. Bila navê rêberê min li ba min xef be. Hema hema her roj ez ji hotêlê radikirim û ez li her devereke Zaxoyê digerandim.

Ji serdema Ksenefon bigire heta roja me ya îroj, zaxoyî bi rêberên xwe yên bi ewle, navdar e û dîsa kî dikare îda bike bibêje ew rêberê min ê niha min li derdora Zaxoyê digerîne, ne nevîçirkê wî kesê rêbertî ji Ksenefon re kiriye?!

Ez jî vê ger û geşta xwe ya li welatê kevana zêrîn, ji feylosof, dîrokzan, geştiyar û mirovê zanamend  Ksenefon, her wiha rêberê wî yê gundiyê kardoxî re nezir dikim. Bi rêzdarî.

**Pira Delal**

Li nav bajarê Zaxoyê pirek heye, jê re dibêjin Pira Delal, Pira Mezin, Pira Şabanî, yan jî Pira Berî. Ev tevdek navê heman pirê ne. Lê navê berbelav tê bikaranîn navê Pira Delal e. Ev pira hanê 1529 sal berê, ji hêla împeratorê bîzansî, Flavius Zeno ve hatiye çêkirin. Pir, xwedî kemereke mezin û çarên piçûk e. Ne ji wan her çar kemeran piçûk be, bi kemera xwe ya mezin gelekî dişibe Pira Malabadê a ku ji hêla Merwaniyan ve hatiye çêkirin.

Xelkê Zaxoyê dibêjin, hosteyê Pira Delal bi yek destî bûye. Gelekî balkêş e ku sêwirandina mirovekî bi destekî li ser dîwarê Pira Malabadê jî tê dîtin.

Li derdora 20 km rojhilatê Zaxoyê jî tirbek heye. Xelk dibêjin ev tirba Zembîlfiroş e. Li bakurê wê tirbê jî çiyayekî bilind heye. Li ser wî çiyayî jî kelehek bi navê keleha Şabanî heye. Tê gotin serpêhatiya Zembîlfiroş li vê keleha Şabaniyê pêk hatiye.

Balkêş e ku xelkê kurd destan û serpêhatiyên xwe bi xwe re li her derê digerînin û wan di bîra xwe de zindî dihêlin.

Ew keleha Şabaniyê ne pir dûr e. Lê ji ber şerê li herêmê rûdide, em nikarin derkevin biçin jor, li ser kela Şabaniyê. Ev keleha Şabaniyê, ji hêla mîrektiyên kurdan ve hatiye avakirin.

Tê gotin gava îngilîz, Iraqê ji destê Osmaniyan derdixînin, hingê Osmanî kesekî bi navê Hesodîno dişîne keleha Şabaniyê û giregirekî îngilîz li vê herêmê dide kuştin. Hesodîno, kesekî ji eşîra Goyan bûye. Osmanî, bi dekbazî kurdan li ser navê umetê di ser îngilîzan de dicixirîne. Mixabin hinek kurd dikevin vê dahfikê.

Hingê Gertrude Bella sîxura îngilîz, rastkêş/cetwela wê di destê wê de bû û sînorên dewletên ereban dixêzand. Navê leqebê wê, Keybanûya Çolê bûye. Keybanûya Çolê, ango Gertrude Bell jî, hîç dilê xwe bi kurdan naşewitîne û radibe xaçekî datîne ser sînga welatê me; erdnîgariya me dike çar beş. Her zîrtolekî welatê me, davêje nav qîlê dirindeyekî.

Ez û rêberê xwe yê zaxoyî, em bi hev re li ser vê rewşa ku pêşiyên me bi siyaseta xwe ya şaş tu tişt ji bo xelkê kurd li ser hev nexistiye, xemgîn dibin. Ez çend wêneyên derdorê digirim û em bi paş ve dizîvirin. Li vegerê, rêber berê erebê ber bi newalekê ve dadigerîne. Bi qasî nîvbîstikekê ez deng ji xwe dernaxînim. Berî ez pirsa "em bi ku de diçin" ji rêber bipirsim, nola nuqutîbe dilê wî, ew bixwe pirsa min a nepirskirî, bi pirsekê dibersivîne: "Seyda tu hez dikî em xemên xwe ji dil derînî?"

Bi vekenîneke bêderbirîn, ez pirsa wî dibersivînim û erê dikim. Lê ez bi formila xemjidilderanînê jî nizanim.

**Kaniya Xeman**

Em li ser kaniyekê disekinin. Navê kaniyê "Kaniya Xeman" ye. Em dest û ser çavên xwe dişon. Paşê jî çend kulm ava qerisî ji Kaniya Xeman kur dikin û xemên xwe ber bi ava wê ve berdidin.

Dotira rojê, 14'ê meha nîsanê ye û ji rojan çarşem e. Ango Çarşema Sor a Serê Nîsanê ye. Me kir û bira xwe kiribû ku em biçin Laleşê. Lê ji ber çend sebeban ji me re li hev nehat. Astengiya herî mezin jî, nebûna derfetên aborî bû.

Nola dêrikî dibêjin "em ca galgalê ji hev re bibêjin?" perê me yê me pê texsiyek kirê bikira û biçûna Laleşê, tunebû. Di hotêlê de, nola devê hêç li min hatiye; hema hew nemaye ez nepoxeke sor a kur ji dawiya gewriya xwe derxînim û bikim i'rre i'rr. Ez li hincetan digeriyam; hema kî têketa ber kela min, ez ê nola lokekî hêç, di ser de xuya bibûma...

Hema bê xwedê kir rêberekî min ê şareza hebû. Ew xwe digihîne hewra min. Ji bo bêhna min derkeve, tê ji hotêlê radihêle min û em ji navenda Zaxoyê bi dûr dikevin. Berê me li deriyê Sêmalka ye. Çiqas dixwazim nola gamêşekî ez xwe li Dîjle bixînim û derbasî wî aliyê çêm bibim.

Hem li rojhilat, hem jî li rojavayê çemê Dîjleyê, hêzên kurdan li ber çavan dikevin. Lê eyan beyan metirsiyek jî tê dîtin.

Ber û berê çem em berjêr diçin. Li derdorê gelek girikên bi dest hatine çêkirin ên şûnwarnasî tên dîtin. Meriv hema çar tevriyan li ku derê bide, ew ê berhemên dîrokî bipengizin li ser rûyê erdê.

Rêber, erebê li ber deriyê dêrekê disekinîne. Dêr, li peravê çemê Dîjle ye. Em daxilî nav dêrê dibin. Dêr ji du beşan pêk tê: dêra nû û dêra kevin. Dêra nû li derdora dused sal berê hatiye avakirin. Dêra kevn jî ji keviran hatiye çêkirin. Ji mîmariya xwe jî diyar dibe ku ew gelekî kevn e.

Dêr, ya kurdên xiristiyan e û navê wê, dêra Pêşxabûr e. Lê ereb navê wê yê rastîn bi lêv nakin û jê re dibêjin dêra Fîşxabûr.

Em ji dêra Pêşxabûrê derdikevin û ber bi Zaxoyê ve vedigerin. Gundek derdikeve pêşberî me. Ew gundê Pêşxabûr e. Gundekî mezin e. Nêvî kurdên êzdî ne, nêvî jî kurdên xiristiyan e. Li jora gund, hêla çiyayê Bêxêr, şahiyek li ber çavan dikeve. Em berê xwe didin devera şahî lê. Belê. Ew şahiya cejna Çarşema Sor a Serê Nîsanê ye û ji hêla êzdiyên gundê Pêşxabûrê ve dihat pîrozkirin. Zarokan, cilên xwe yên paqij û rengoreng li xwe kiribûn. Nola kulîlk û gangilokên biharê bûn.

**Pêşxabûr**

Em ji gundê Pêşxabûr vediqetin û berê xwe didin Zaxoyê. Li vegerê ez wateya navê deriyê Îbrahîm Xelîl ji rêberê xwe dipirsim. Ew jî yekser berê me dide ser goristanekê. Goristan, bi ser bajarê Zaxoyê ve ye û bi dîwarekî bilind hatiye dorpêçkirin. Xelkê digot tirbek di nav wê goristanê de heye. Ew tirba Hz. Îbrahîm e. Lê paşê ez hîn dibim ku ew tirba zatekî bi navê Şêx Îbrahîm Xelîl e û navê wî zatî daye deriyê gumrikê yê hêla Başûr.

Ji tirba Şêx Îbrahîm Xelîl wêdetir, tirbeke din li ber çavan dikeve. Rêber, maleke duqat şanî min dide, dibêje ev tirba xortekî ji vê mala hanê ye. Di şerê navbera kurdan xwe bi xwe  de, jiyana xwe ji dest daye.

Xwêdaneke sar, dadiwerive nava derzika pişta min. Nola erd biheje, wanî dinya li dora min dizîvire.

Zengilê telefona min lê dide. Bi dengê zengil re, ez vediciniqim. Ji malê li min digerin. Çawa ez telefonê vedikim, dengê karika min, ango dengê Bêrîtana min di guhê min de dizinge: "bavooo!.."

Goristan li dora min dibe nola gerînekekê. Tevî dar û berên xwe li dora min doş dibin û ez noqavî filma Xelîl Îbrahîm Ûysal/Xelîl Dax, yê bi navê Bêrîtan dibim. Şirîta film dizîvire û ez jî pê re...



